## 9'EMÎN MÎHRÎCANA ÇAND Û HUNERÊ YA AMEDÊ

# Xeyalên azadiyê pêk bînin!

**Mîhrîcana Çand û Hunerê îsal bi şîara "Bi çand û hunerê xeyalên azadiyê pêk bînin" di 27'ê gulanê de dest pê dike. Di mîhrîcanê de çalakiyên wekî şano, sînema, pêşangeh û konserên bi dehan hunermendan dê bên lidarxistin**

MÎHRÎCANA Çand û Hunerê her sal wekî kevneşopiyekê tê lidarxistin. Mîhrîcan îsal ku dê 4 rojan bidome, di navbera 27-30'ê gulanê de pêk tê. Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr di daxuyandina bernameya mîhrîcanê de diyar kir ku Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê bûye marka.

BAYDEMÎR diyar kir ku dê di roja yekem a mîhrîcanê de pêşangehên wêne, resim, guhdarîkirina muzîk û şanoyê pêşkêş bikin. Baydemîr naveroka mîhrîcanê wiha got: "Mîhrîcan dê 4 rojan bidome. Di roja dawî ya mîhrîcanê de dê hunermendekî surprîz konserekê bide. Niha dema mîhrîcan, aştî û demokrasiyê ye. Mîhrîcan dê bi meşa aştiyê bi dawî bibe."... RÛPEL - 6



## Du pirtûkên nû derketin

Li pirtûkxaneya kurdî 2 pirtûkên nû zêde bûn. Nivîskar Cîhan Roj ku beriya niha bi nivîsandina helbest û çîrokan derketibû pêşberî xwendevanan, niha jî bi romana 'Gîtara Bê Têl' derket pêşberî xwendevanan. Her wiha nivîskar Çiya Mazî bi pirtûka çîrokan ya bi navê 'Mijarên Mîqro' gihîşte hezkiriyên pirtûkan... RÛPEL - 6


# HAWAR

Rojnameya Rojane

22 Gulan 2009
În
Sal: 1
Hejmar: 17
Buha: 50 Kr


## Ji bo Kameraya Zêrîn têdikoşe

Derhênerê kurd Akram Kiro bi kurtefîlmê 'Havîna Sor' beşdarî Mîhrîcana Cannesê dibe. Kurtefîlmê Kiro di beşa Kameraya Zêrîn de hate nîşandan. Kiro anî ziman ji ber ku li cihekî mîna Cannesê fîlmê wî hatiye nîşandin kêfxweş bûye... RÛPEL - 6



# Tecrûbeya wî QETLÎAM e

Serokomarê Srî Lankayê Mîhandra Rajapaksa ku bi operasyona dawî bû sedema kuştina 7 hezar sivîlên tamîlî bi telefonê li Serokomarê Tirkiyeyê Abdullah Gul geriya û jê xwest ku Tirkiye jî li dijî kurdan ji tecrûbeyên wan sûdê wergire. Tecrûbeya Srî Lankayê jî bi yek gotinê **QETLÎAM** bû



*Artêşa Srî Lankayê bi operasyona xwe ya dawî Welatê Tamîlan kiribû gola xwînê û piraniya kuştiyan jin û zarokên tamîlî bûn.*

### JI TIRKIYEYÊ RE TEKLÎFA BÊ EDEB

Piştî ku Artêşa Srî Lankayê bi hêzeke mezin ket Welatê Tamîlan û bi qasî 7 hezar sivîl qetil kirin, ji ber ku Srî Lankayê hebûna wan dikir hincet, Pilingên Tamîlan ên azadîxwaz neçar man ku li hemberî qetlîama sivîlan çekên xwe deynin. Di van rojên ku behsa çareserî û diyalogê li Tirkiyeyê tê kirin de, Serokomarê Srî Lankayê Mîhandra Rajapaksa bi telefonê xwe gihand Serokomar Gul û jê xwest ku ji tecrûbeyên wan sûdê wergirin.

### TECRÛBE 'QETLÎAMA SIVÎLAN' E

Wekî tê zanîn Artêşa Srî Lankayê bi fermana Rajapaksa ketibû welatê tamîlan û tu ferq û cudahî nexistibû navbera sivîl û gerîlayên Pilingên Tamîlê. Li gorî daneyên hêzên navneteweyî 7 hezar sivîlên tamîlî ku piraniya wan jin û zarok bûn di encama êrîşên Artêşa Srî Lankayê de jiyana xwe ji dest dan. Her wiha çend pêşengên Pilingên Tamîlan jî ji aliyê Srî Lankayê ve hatibûn qetilkirin.

### QETLÎAMA KURDAN TÎNIN ROJEVÊ

Her çiqas gelek nivîskarên wekî; Ertugrul Ozkok, Ortay Ekşî û M. Alî Bîrand di wê baweriyê de ne ku rêbazên Srî Lankayê li Kurdistanê encam nadin jî bi vê hevdîtinê re dîsa fikar û tirsa gelê kurd a ji qetlîaman zêde bû. Wekî tê zanîn gelek caran hin derdorên nijadperest ji hikûmet û artêşa tirk xwestibûn ku gund û kesên sivîl ên piştgiriyê didin PKK'ê bikin hedef û ewil ew bên berterefkirin. Nehat zanîn ka Serokomar Gul çi bersiv daye Rajapaksa.

## Ji bo çareseriyê divê nexşerê bê amadekirin

**RÊXISTINÊN** civakî yên demokartîk ên li Amedê têkildarî nîqaşên çareseriya pirsgirêka kurd daxuyandin ku divê nexşeriya çareseriyê bê derxistin. Serokê Şaxa ÎHD'ê ya Amedê Muharrem Erbey diyar kir ku pirsgirêka kurd pirsgirêkeke entîk û polîtîk e. Serokê Odeya Bazirganî û Pîşesaziyê ya Amedê Galîp Ensarîoglu jî bi bîr xist ku Serokomar Abdullah Gul di warê çareseriya pirsgirêka kurd de însiyatîf girtiye. Serokê Odeya Tabîban a Amedê Dr. Adnan Selçuk Mizrakli, der heqê çareserkirina pirsgirêka kurd de daxuyaniyên balkêş dan... RÛPEL - 4

## Komkujî ji ber pergala cerdevaniyê ye

**JINÊN** endamên ÎHD, KESK, TTB, Halkevlerî, Meclîsa Aştiyê ya Tirkiyeyê, Platforma Jinên Endezyar û Weqfa Hevgiriya Jinan ku bi heyetê komkujiya Zankirtê lêkolîn kirin, çavdêrî û daneyên berhev kirin bi daxuyaniyekê li Navenda Giştî ya ÎHD'ê aşkera kirin. Di daxuyaniya nûnerên saziyan beşdar bûn de ji berdevkên Meclîsa Aştiyê ya Tirkiyeyê Yuksel Mutlu rapor aşkera kir. Mutlu got ku bi şaredarên jin ên DTP'ê û 6 saziyên jinan ên li Amedê re lêkolîn kirine. Di raporê de hate daxuyandin ku sedema komkujiyê ne tore û namûs e, komkujî di encama pergala cerdevahiyê de pêk hatiye...RÛPEL - 7

## Zana: Di hucrê de tazî kirim û ceryan dan wicûdê min



Siyasetmedara kurd Leyla Zana beşdarî konferansa bi navê 'Hêza Azadiyê û Esaleta Mirovahiyê' ya ji aliyê Foruma Freedomê ve li paytexta Norwec Osloyê hate lidarxistin bû. Zana, yekemîn car serboriyên xwe yên di zindanê de bi raya giştî re parve kirin. Leyla Zana di axaftina xwe de anî ziman ku wê bi baweriya ji bo azadiyê li hemberî işkencê kariye li ber xwe bide û wiha got: "Di odeya îşkenceyê de bûm. Hem bi pehînan li min dixistin û hem jî ji min dixwestin ku xwe tazî bikim. Li aliyekî min li ber xwe dida û li aliyekî jî bêwatebûna xwenuxamtina di hucreyê de difikirîm."... RÛPEL - 4

## Welatê Tamîlan û Kurdistan

Hêzên serdest ên plan dikin cîhanê li gorî xwe dîzayn bikin û bi rê ve bibin, dixwazin hêzên rizgarî-azadiya gelan ji holê rakin. Di vir de armanca bingehîn ew e ku hêzên karibin ji bo gelên din ên bindest bibin model tune bibin. Li hember PKK'ê û rêbertiya wê meşandina komplo û konseptên tunekirinê jî ji ber heman armancê pêk tên. Modelbûna PKK'ê ya ji bo gelên bindest a li herêmê tirsa herî mezin a hêzên global ên serdest e...



*Aziz OGUR* - RÛPEL - 2

www.arsivakurdi.org



Beroj

Azîz Ogur
abdulazizogur@hotmail.com

# Welatê Tamîlan û Kurdistan

Bi hevkariya hêzên global û netew-devletên statukoparêz, mirovahî êşên dijwar dikişîne. Tevkujiya li hemberî gelê tamîlî mînakek ji ya vê hevkariya kirêt a li dijî gelên bindest û azadîxwazan e. Beriya her tiştî divê ev tevkujî, encameke afirandina 'cîhana yek qutbî' ya dixwaze hemû rengên cuda ji holê rake were dîtin. Yanî mudaxeleyeke hêzên xwedî sîstema postmodern a li hemberî dînamîkên azadî, serxwebûn û dewlemendiya çandî ye. Mîna di tevkujiya li hemberî gelê tamîl de jî xuya kir, bi hêzên tevkujî pêk anîn, ên destek dane vê tevkujiyê û yên bi bêdengî ev yek temaşe kirin jî xuya dike ku êdî tu şer an hewldanên çewisandina tevger û hêzên azadîxwaz, nikare bi herêmîbûn an mijareke di nava sînorên dewleteke de bên nirxandin. Encamên ku pêwîst e ji tevkujiya li dijî gelê tamîlî û bi hevkariyeke berfireh meşandina konsepta tunekirina Tevgera Pilingên Ealem ê Rizgariya Tamîl (LTTE) werin derxistin hene...

### Tevgerên Model û jiholêrakirina hêviyan

Hêzên serdest ên plan dikin cîhanê ji bo li gorî xwe dîzayn bikin û azadiya gelan ji holê rakin. Di vir de armanca bingehîn ew e ku hêzên karibin ji bo gelên bindest bibin model tune bibin. Amadekirina lîsteyên rêxistinên terorîst û di çarçoveya komplo û konseptên navneteweyî û hevkariyê mezin ên leşkerî de çûna ser van tevgeran. Yanî mirovahiyeke bêhêvî û mahkûmî sîstema hêzên serdest ên global dixwazin biafirînin. Li hember PKK'ê û rêbertiya wê meşandina komplo û konseptên tunekirinê ji ber heman armancê pêk tên. Modelbûna PKK'ê ya ji bo gelên bindest a li herêmê tirsa herî mezin a hêzên global ên serdest e.

### Qehremantiya gel û jiholêrakirina pêşengan

Mîna rêxistinên model ên azadîxwaz, pêşengên van rêxistinan, rêberên gelên bindest û têgîna qehremaniya gel jî yek ji tirsa mezin a serdestan e. Di operasyon û êrîşên li herêma Tamîlê de hedefa bingehîn lîder û sazûmankarê tevgera LTTE Velupillai Prabhakaran bû -Tevî misoger nebûye jî tê gotin ku hatiye kuştin- . Ji Spartakus, heta bi Omer Muxtar, ji Martîn Luther Kîng heta bi Che Guara, ji Abdullah Ocalan heta bi Velupillai Prabhakaran ev tirs û xofa serdestan a ji rêber û pêşengên gelê bindest heta roja me neguherî.

Mafên çandî têkbirina têgîna azadiyê Serdestên cîhanê her çiqasî gotina 'azadî' mîna têgîneke bingehîn bikar tînin jî tu têkiliya wan bi azadiyê re nîne. Berovajî bi gotina qaşo azadî, azadiyan tune dikin. Di konsepta ku dane ber xwe de, azadkirina gelan, serxwebûn û wekhevî bi tu awayî nayên qebûlkirin. Bi jiholêrakirina dînamîkên berxwedanê yên van gelan re, dayina hin mafên 'çandî' -mîna TRT 6 a dewleta tirk- û bi vê bisînormayinê li gelan ferz dikin. Piştî vê yekê jî di dema navîn an dema dirêj de, bi ferzkirina çanda postmodern plan dikin hêdî hêdî cîhaneke yekreng, yekdeng biafirînin.

Hin hebûnên çandî yên bihêlin jî mîna amûrên tetmînkirina zewq a çav, beden û ajoyên xwe binirxînin. Di vir de rastiya çîna dewletî ya yek qutb jî bi hemû rastiya xwe derkete holê. Hin dewletên qaşo li hember projeyên DYA'yê dihatin binavkirin yên mîna Çîn, Rusya û hwd tev parçe an mezhebekî sîstema li ser mirovahiyê tên ferzikirin in. Heger behsa qutb an- aliyan were kirin êdî divê were dîtin ku hemû hêz û hebûnên dewlet an di bin bandora dewletbûnê li aliyekî ne. Li aliyê din jî gel û komên bindest hene. Xuya ye hêzên serdest ên global ji bo têkbirina îradeyên azad ên gelan û hêzên berwedêr bi hemû sazî û dezgehên xwe ji NATO heta Neteweyên Yekbûyî ji her alî ve organîze bûne û di tevgerê de ne. Lê mixabin di vê rewşê de mirov nikare behsa muxelefeteke karibe vê rewşê pêşwazî bike rêxistinkirî bike.

### Serkeftin dîsa dê ya mirovahiyê be

Lê ev bi tu awayî nayê wateya ku hêzên serdest ên global çawa dixwazin wê wisa planên xwe bi ser bixin. Mîna tê xwestin ne rêxistinbûyina muxalefeta globîzmê nayê wateya ku hêza gelan tune ye. Mîna serdemên borî dîsa mirovahî berdelên wê çi dibe bila bibe wê riya xwe bibîne û bi têkbirin an guhartina sîstema kapîtalîst ber bi şaristaniyeke demokratîk ve biçe. Bila neyê jibîrkirin ku her tim di demên herî giran û kêliyên ku hêvî tune dibin de pêxember, qehremanên gel, pêşeng û rêber derketine û mirovahî gaveke din bipêş de birine. Tevî hemû hevkariyên kirêt, komplo û êrîşan jî bi serbilindî hilgirtina meşaleya berxwedanê ya Rêber, gerîla û gelê kurd naxwa çawa dikare were binavkirin?

# Qîrîna dayikên windayan

ABDURRAHMAN KARATAŞ

Pêwîst e çîrokên kesên winda yên bi êş bêne ziman. Ji ber ku qîrînên dayikan bêwate nemînin. Em wê yekê nekin, dayikên ku kezebên wan hatin şewitandin û cerg û mêlakên wan hatin sotin, wê çawa ji bo hêvî û keserên wan bibe bersiv?

Gelo em wê yekê nekin, windayên ku hejmara wan bi qasî nifûsa bajarekî ku ji aliyê kesên kiryarên wan qaşo ne diyar ve hatin windakirin û li ber çavên dê, bav û zarokên wan, hinek ji wan bi şev û hinek ji wan roj nava rojê, ji aliyê hêzên tarî ve hatin binçavkirin û her wiha careke din qet venegeriyan mala xwe. Gelo, ji bo mirovahiyê wê ji me hesab neyê pirsîn? Gelo em wê yekê nekin, di kolana xirabajarekî de ku nêzîkî nîv sedsalekê kevnare ye de, bi dîtina êlekekî mêran ku bi dest hatî neqişandin û her wiha nîvî jê riziyayî û bûyî hêviyek ji bo malbetê û bi heman hêviyê bi dîtina vî êlekê mêran, malbatê ku wekî şensekî ji xwe re dîtî, gelo wê di wijdanê mirovahiyê de nebe birînek kûr?

Gelo em vê yekê nekin, rojek ji havîna germ, li deşta Silopiyê, li gundê Qortikê ku kur ji bav standin û dema birin kur li bavê dikire qîrîn, bavo min ji destê guran xilas bike, ma gelo, kesên dibêjin em însan in li hemberî vê qîrîniyê, wê çawa bersivê bidin?

Belê çîroka her yek ji wan tarî û xemgîn e. Lê mixabin ku neyên gotin, ji bo nivşê nû, wê bibe wekî serpêhatiyeke kevnare. Ev bi dehên salan e çavên dê, bav û zarokên wan li ber deriyan li benda wan in, tu carî rondikê çavên dê û bavan nesekiniye.Tim bi hêviya rojekê ku wê li wan vegerin ew mane. Car caran bi hêvî, car caran jî bê hêvî ew li benda wan mane. Ji ber ku li welatê wan kuştin û girtina mirovan bûbû adet ji bo wan. Û piştî demeke dirêj, geh bi kolana bîrekê, geh bihust bi bihust di kolana erdekî beyar de bi hêviya dîtina hestiyekî windayan, êş û kesera dilê dê û bavan ji nû ve der dibûn.

Belkî careke din ew lawê xwe wekî berê nikaribe hembêz bike, lê bi dîtina hestiyê kezeba xwe ew karibe lorîk û tewêniya li ser bibêje. Ew jî dizane ku îcar nikare ji kesera xwe re êlekan bineqişîne, lê ew bi hêvî ye ku hetanî sax be li dinyayê ew hestiyê wî li pişta xwe bike. Ev yek rûreşîya mirovahiyê ye, kelemekî reş e li ber çavên cîhana em tê de dijîn.

Gerek mirovahî ji xwe fedî bike, yên behsa wan tê kirin mirov in. Lê mixabin, li welatê em tê de dijîn navê çandê danîne çanda windayan. Ji ber vê jî, windayên kiryarên wan ne diyar, her çiqasî ew bi xwe newine diyarkirin jî, bi dîtina hestiyên wan jî dîsa em şikirdar in ji ber ku gorek ji hestiyên wan jî diyar bibe, ji bo dê û bavan hêviyeke mezin û bi wate ye. Belkî wekî miriyên roja înê dimirin ku xwediyê xwe dibînin, belkî dê û bav jî kesera dilê xwe wî çaxî bibînin.






Roşn

Mamosta Silêman
mamoste.suleyman@hotmail.com

# Kesayetî û asîmîlasyon -I-

Gelo asîmîlasyon (helnayiş) çi yo? Asîmîlasyon; miletêka hetê yewna (yewbîna) milete yan zî bi xo bi xo, bi zor yan zî bi waştiş; fek kultur, ziwan, tarîx û erjayeyanî xo yê bînan ra verrado û kultur, ziwan erjeyanî yewna milete qebûl biko (bikero) û goreyê nê kulturê ciwîyayîş o.

Gelo kesayetî çî ya? Kesayetî zî; her merdim goreyê xo, der û dorê xo de, şeklê hîskerdiş û bonderbîyayîşê hedîseyan de û mûqabîlî înan de yew tepkî nawneno, no reaksîyon kesayetîya merdiman dano dîyarkerdene. Kesayetîya merdiman a yewine, genetîkê merdiman ra, yanî bîyayişê mayê ra, a dîyin zî der û dor û prosesê heyatê merdiman de yena meydan. Yanî kesayetî; xûsîsîyetanî yê tebîîyan û prosesî heyatê merdiman ra yena meydan.

Bi yewna vatiş, asîmîlasyon; prosesê çîyo ke mîyanê yewna çîyê mîyan de yeno helnayene, manaya xo , eslê xo vînî (vîndî) keno, beno yewna çîydo cîya. Asîmîlasyon, bedilîyayişê/bedilnayiş û qedinayişê nasnameyî yo. Merdim , bi kultur, ziwan û erjeyanî xo yê bînan esto, bê kultur, ziwan û erjeyanî bînan , yew nişno behsê estbîyayişê yew milete biko.

Sîstem bi polîtîkaya asîmîlasyonê ; şaran, şexsan xo ra gireydano. Armancê polîtîkaya asîmîlasyonê, şaran û şexsan entegreyê sîstemê kerdiş o, dima zî bi asîmîlasyonê, kesayetîya nê şaran û şexsan dejenere kerdiş o, kîmyaya înan herimnayiş o.

Bi polîtîkaya asîmîlasyonî; hunerê mûhakemeya şexsan û grûban qedîyêna. Herinda na mûhakeme de, hîsîyatî ca gênî. Dişmeney, kin û nefret hakim beno. Na rewşe de, beyntarê merdiman de bawerey nêmanena. Beynanî merdiman de adeta yew mabedê (tapinaxê) tersayişê virazîyêno. Merdimî, îstîqbalê xo ra bawer nêbenî.

Huqûqzanaye John Lojke vano; her komel, her kesayetî wayîrê heqê ciwîyayiş, azadî, warîdat û serweta xo yê taybetê ya. Nê hîrê heqî yewnan ra nîynî cîya kerdiş. Goreyê Teşkîlatê Weşbîyayişê Dinya; weşbîyayişê merdiman, tena gireydeyeyî ruh û bedenî nîyo. Eke merdim bi ziwanê xo, xo îfade nêko, kê nişnî ewta de azadîyey ra behs bikî.

Polîtîkaya asîmîlasyonê de zafê ey, nîjadperesteya serdestan esas girîyêna, feqet ewta de, dîn û mezhebî zî yenî şuxûlnayene. Mesela vanî" Dînê ma, mezhebê ma yew î, ma hewayê birayanî yewnan î. Xora heme kes bi ziwanê xo; kuçan de, keyeyan de qalî keno. Heme kes şîyno wayîrê kar û gure û meqamî bibo." Qorî merdimî; bi nê vatişan xapîyênî, Hetta nê merdimî ke xapîyênî vanî; " Kar û gureyê ma esto, pîzeyê ma pirr o û dînî ma zî yew o. Ma hinê ko homay ra çi biwazî." Nê bêj merdimî qralî ra vêşîr qral benî. Tabî sîstem zî mûqabîlî sedaqetey û xizmetê de tayê xelatan dano nê bêj merdiman. Heme berî sîstemê nê merdiman rê akerdeyî. Nê bêj merdimî ziwanê xo ra, kultur û tarîx û welat û heme erjeyanî xo yê mîlî ra dûrî kuwenî. Nê merdimî wazenî ke hewayê serdestan wardî, roşî, qalî bikî û têbigeyrî. Rasta ey polîtîkaya asîmîlasyonî; têkilîya çim ra vistiş û heqeretê ra vêşîr yewna çîy nîya. Serdest, bindestê çend asîmîlasyonê de serbikewo, ende xo bextîyar veyneno. Bindesto ke polîtîkaya asîmîlasyonî rê xizmet keno, endi xelatan gêno û qarşîyî serdestan mînnetar maneno. Na têkilê de, esla heq, edelet, yewîyey çin a. Hetta serdest, tayê heqeretan biko zî bindesto sadiq nê heqeretan zaf normal veyneno. Mesela verî vatnî; " Kurdan nameyê xo qart-qûrtê ra girewto. Kurdî boçin î. Kurd ewlîya bo zî ey megêre hewşê xo. Kurdî, heyat de, merdim nêbenî. Kurdî, bi eslê xo, armenî yî." Ewta de, heqeret armenîyan zî kenî. Hewteyo ke yeno ma nê mewzûyê dewam kenî. Bimanî weşî de…

HAWAR
Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti. Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
Bedri ADANIR
Adres:
Kooperatif Mahallesi
Gevran Caddesi 1 Geçit.
Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis
Yenişehir - Diyarbakır
TEL: 0 (412) 229 00 30
Fax: 0 (412) 229 00 39

Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A
Sefaköy - Küçükçekmece İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 80
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş
İstîklal mah. İstîklal. Cad.
No: 44 Seyhan
Edene
Yayın Türü: Süreli

www.arsivakurd.org



# Elçî li girtîgehê terkî mirinê kirin

**Di girtîgeha Tîpa E ya Mêrsînê de ji ber tedbîr nehatin girtin nexweşê sarayê Mustafa Elçî jiyana xwe ji dest da, lê girtîgeh ji bo ku sûcê ji ser xwe bavêje îdia kir ku Elçî dawî li jiyana xwe aniyê**

Malbata Mustafa Elçiyê nexweşê sarayê ku hate angaştin li Girtîgeha Girtî ya Tîpa E ya Mêrsînê întîhar kiriye, nerazîbûn nîşan da û daxuyand ku kurê wan xwe nekuştiye. Birayê Mustafa Elçî, Abdulkadîr Elçî, daxuyand ku birayê wî ji ber xemsariya dewletê jiyana xwe ji dest daye û wiha got: "Li girtîgehan cezayê mirinê li ser kurdan bi van rê û rêbazan pêk tên. "

Hate angaştin ku Mustafa Elçiyê 21 salî ku li qawîşa B/4 a Girtîgeha Girtî ya Tîpa E ya Mêrsînê dima întîhar kiriye.

Li hemberî vê îdiayê malbata Elçî nerazîbûn nîşan da û daxuyand ku kurê wan xwe nekuştiye û di encama xemsariya dewletê de jiyana xwe ji dest daye. Dayika Elçî, Ayten Elçî anî ziman ku bûyer ne întîhar e; ji ber xemsariya dewletê kurê wê jiyana xwe ji dest daye. Elçî ev tişt gotin: "Me ji polîsan û ji dozgerê Mêrsînê yê ku biryara girtinê da û ji rayedarên girtîgeha Mêrsînê re jî gotibû ku Mustafa nexweş e û tedawiyê dibîne. Me rapora nexweşiya Mustafa jî da wan. Me got nexweşiya wî heye, divê baş bê tedawîkirin. Lê ligel ku Mustefa nexweşê sarayê bû jî rayedarên dewletê ew terkî mirinê kirin."

### Me serî li saziya mafên mirovan da

Ayten Elçî, derbirî ku kurê wê ji ber nexweşiya xwe her tim ji xwe ve diçû û wiha domand: "Kurê min dema serê xwe jî dişûşt ez ligel dimam. Ji ber ku nexweşiya wî bi pêş ketibû, nediyar bû ka dê kengî bikeve. Dema kurê min li derve bû jî çend caran polîs hatin û ew pirsîn. Me ji ber nexweşiya wî ew nedişand dadgehê. Me serî li Şaxa ÎHD'ê ya Mêrsînê jî da lê ji wir jî me tu encam negirt."

### Em qewirandin

Elçî ku xemsariya rayedaran wekî sedema mirina kurê xwe nîşan da, wiha domand: "Herî dawî jî em çûn gel Lijneya Mafên Mirovan a Qeymeqamiya navçeya Akdenîzê. Li wir jî ji dêvla ku bi me re mijûl bibin, em ji wir qewirandin. Herî dawî dîsa polîs hatin û gotin 'bila Mustafa were dadgehê, dê li dadgehê were berdan.' Li ser van axaftinan Mustafa bi birayê xwe re çû Midûriyeta Polîsan û li wir jî kurê min girtin û birin girtîgehê. Bêyî ku tedbîrên tenduristiyê bigirin wan dibin girtîgehan. Di êvara heman rojê de kurê min mirî tê dîtin. Rojekê jî li girtîgehê nema."

### ' Çi pêwîst bike em ê bikin'

Li ser mijarê Ayten Elçî, diyar kir ku dê der heqê Dozgeriya Komarê ya Mêrsînê, Miduriyeta Polîsan a Bajar û rayedarên Girtîgeha Mêrsînê de giliyê bikin û wiha pê de çû: "Wan hundirê min şewitandiye. Ji bo berpirs bên dazirandin çi ji destê me bê, em dê bikin."

### Bi van rêbazan kurdan dikûjin

Birayê Elelçî, Abdulkadir Ellçî jî diyar kir ku rayedarên dewletê berpirsiyarên mirina birayê wî ne û wiha pê de çû:

"Divê dewlet li hemberî kesên ku pirsgirêka wan a tenduristiyê heye hestiyar be. Lê ji ber ku birayê min kurd bû û girtiyekî siyasî bû, ew terkî mirinê kirin."

### Ji ber Newrozê hate girtin

Elçî ku jiyana xwe ji dest da û birayê wî Huseyîn Elçî, bi hinceta tevlî Newroza 2008'an bûne û "propagandaya rêxistinê kirine" li 7'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Edeneyê, dihatin darizandin. Di danîşîna meha borî ya biryarê wî de Elçî bi 10 mehan cezayê girtîgehê, hate cezakirin. Elçî, ji ber ku bi nexweşiya sarayê bû û nikaribû di şert û mercên girtîgehê de bimîne, teslîm nebû. Lê herî dawî ji ber ku gelek polîs hatine mala wan, Elçî teslîm bûye. **MERSÎN / DÎHA**

## Riyên gundên Licê hatin birîn

**AMED**

Çavkaniyên herêmî diyar kirin ku hêzên tirk li bejahiya Liceyê operasyoneke berfireh ya li dijî gerîlayên HPG'ê dimeşînin. Kesên ku dixwazin biçin gundên Hedîk, Bayirli, Seyrek, Saydamli û Akçabûdak, bi sedema operasyonê rastî astengiyê tên. Çavkaniyên herêmî anîn ziman ku hêzên tirk gundî ji Geliyê Cum paşde vegerandine.

## Li Êlihê 2 kes hatin girtin

**ÊLIH**

Ji 3 ciwanên li Êlihê hatin binçavkirin 2 jê bi hinceta, "Propagandaya rêxistinê kirine" hatin girtin. Yekîneyên Midûriyeta Polîsan a Êlihê pêr bi ser malan de girtibûn û 3 kes binçav kiribûn. Piştî pirsiyariya welatiyên bi navên S. I., Huseyîn Solak û Hurriyet Şahîn a li Midûriyeta Polîsan, ew derxistin dozgeriyê. S. I. piştî îfadeya li dozgeriyê serbest hate berdan û 2 kesên din bi hinceta, "propagandaya rêxistinê kirine" hatin girtin.

## Iraq bi êrîşên întîharî diheje

**BEXDA**

Êrîşên întîharî li Kerkûk û Bexdayê pêk hatin. Çavkaniyên ewlekariyê dan zanîn ku li başûrê Kerkûkê êrîşkarek ketiye nav mîlîsên çekdar ên Sahwayê û bombeyên li ser xwe teqandiye. Di encama teqînê de 7 mîlîs mirin û 4 jî birîndar bûn. Li Bexdayê jî duh û pêr êrîşên întîharî pêk hatin. Di teqîna duh de 12 kes hatin kuştin û 41 kes jî birîndar bûn. Di nav kuştiyan de leşkerên Amerîkayê jî hene. Di teqîna pêr de jî bi kêmanî 41 kes hatin kuştin, zêdetirî 70 kes jî birîndar bûn.

# Mirina leşkerê kurd a bi guman

Li Sûriyeyê her ku diçe bayê nijadperestiya ereb zêde dibe. Kuştina leşkerên kurd a bi guman a di nava Artêşa Sûriyeyê de dewam dike. Ciwanekî kurd ji Kobanê çû leşkiriyê û piştî 3 rojan li wir mir. Ji sala derbasbûyî heta niha herî kêm 8 ciwanên kurd bi vî rengî, bi guman mirine an jî hatine kuştin. Li gor çavkaniyên herêmî, di 9'ê gulanê de ciwanê kurd ê bi navê Ehmed Sadûn ku ji Kobanê ye çûye leşkeriya Sûriyeyê, di 12'ê gulanê de jiyana xwe ji dest daye. Dîsa li gorî heman çavkaniyan Sadûn nexweşê astimê bû, lê ev nexweşiya wî li ber çavan nehatiye girtin û di encamê de jiyana xwe ji dest daye. Heta niha tu daxuyanî ji aliyê rayedarên Hikûmeta Sûriyeyê ve nehatine dayîn. Ji destpêka sala 2009'an ve ev bûyera 3'yemîn a bi vî rengî ye û di encamê de ciwanên kurd jiyana xwe ji dest dane. Yek ji wan ciwanan Berxwedan Xalid Hemo bû ku di 19'ê çileyê de bi guleyê hatibû kuştin. Her wiha ciwanê bi navê Muhemed Bekir Şêx Dada jî di 13'ê çileyê de, bi angaşta ku xwe kuştiye cenazeyê wî radestî malbatê kirin. Ji sala 2008'an ve 5 ciwanên kurd bi şêwazên biguman li leşkeriyê mirin. Di sala 2006'an de jî kuştinên wiha bi guman hatin rojevê. Wê demê jî 2 ciwanên kurd yên bi navên Xelîl Silêman û Mihemed Oso Alî di dema leşkeriyê de jiyana xwe ji dest dabûn. **KOBANÎ**

# Bi çandina daran bajar tên xemilandin



Li navçeya Wêranşara Rihayê û navçeya Gevera Wanê yekîneyên şaredariyê dest bi çandina şitlan û çîmê kirin.

Şaredariya Wêranşarê, li çep û rastêriya herî mezin a navçeyê Îpekê li ser 8 doniman çîm çand. Yekîneyên Şaredariyê yên park û baxçeyan, di xebatên serastkirina derdorê de 25 hezar kulîlkên demsalî jî çandin. Şaredara Wêranşarê Leyla Guven, diyar kir ku ji bo navçe bi tevahî bi şînahiyê bê xemilandin dê hewldanên xwe bidomînin û wiha got: "Em wekî şaredariyên DTP'ê girîngiyê didin ekolojiyê. Ji bo gelê me di nava şînahiyê de jiyana xwe berdewam bike, hewldanên me dê bidomin. 22 parkên me hene. Em ê ji bo jinan ji parkan çêkin. Di van aliyan de jî projeyên me hene."

### Li Geverê 25 hezar şitl

Şaredariya navçeya Geverê û Konseya Bajar, ji bo bajarekî kesk ava bikin û derdoreke paqij biafirînin şitlên daran belav kirin. Di belavkirina şitlan de Şaredara Geverê Ruken Yetîşkîn, Serokê Komeleya Nivîşkanan Şaban Kesîcî, Rêveberên DTP'ê, Rêveberên KURDÎ DER'ê, Seroka Konseya Bajar Hulya Anuk Yîgît û endamên meclîsê amade bûn. Yîgît, diyar kir ku ji bo ew bajarekî kesk û paqij ava bikin şitlan belav dikin û wiha got: "Li navçeya me darên spîndarê zêde ne. Em ê şitlên darên cur bi cur ku li gorî şert û mercên hewayê çêdibin biçînin. Bi taybetî darên çam, sedar û gelek cureyên din hatin belav kirin. **COLEMERG / RIHA / DÎHA**

# Savaş Guler li Amedê hate definkirin

Ciwanê kurd ê bi navê Savaş Guler ku li navçeya Akyaziya Sakaryayê di encama êrîşa çekdarî ya nijadperestên tirk de hate qetilkirin, li gundê Şêxana navçeya Hênê ya Amedê hate definkirin.

Li navçeya Akyaziya Sakaryayê du roj berî niha ciwanê kurd ê bi navê Savaş Guler rastî êrîşa Zahît Bostanci û xalê wî S. A. ku tê gotin nijadperest in, hatibû. Di encama êrîşê de Savaş Guler jiyana xwe ji dest dabû û Recep Can Guler jî birîndar bûbû. Tedawiya Recep Can Guler li Nexweşxaneya Dewletê ya Sakaryayê didome. Cenazeyê Savaş Guler jî li gundê Şêxana navçeya Hênê ya Amedê hate veşartin. DTP'î jî beşdarî merasîmê bûn û li navenda Amedê li Mala Şînê ya Hêniyan sersaxî tên qebûlkirin. **AMED**

# Îsraîl amade ye bi Sûriyeyê re rûne

Serokwezîrê Israîlê Benyamîn Netanyahû piştî serdana xwe ya Amerîkayê, li Tel Avîvê daxuyaniyek da û got, ji bo aştiyê ew amade ye bê şert ligel Sûriyeyê bicive û pirsgirêkên xwe bi riya diyalog û hevdîtinan çareser bikin.

Netanyahû diyar kir ku ew li ser vê meselyê bi Serokê Amerîkayê Obama re axiviye. Berî ku Israîl êrîşî Gazzeyê bike, hevdîtin di navbera her du welatan de berdewam bûn. Piştî êrîşkirina Gazzeyê, hevdîtin rawestiyan. Netanyahû got, ew amade ne careke din û ji nû ve hevdîtinan bidin destpêkirin. Li aliyê din Netanyahû got, ew Girên Golanê ku di sala 1967'an de hatibûn dagirkirin, li Sûriyeyê venagerînin, lê belê ew amade ye ligel Beşar Esed bicive.

Sûriyeyê jî ji bo hevdîtinan vegerandina Girên Golanê weke mercekî sereke datîne pêşiya Israîlê. Serokwezîrê Israîlê Netanyahû, li balafirgeha navnetewî ya Tel Avivê Gourion, ji rojnamevanan re axivî û got, ew amade ye bêmerc hevdîtinên aştiyê bi Sûriyeyê re dest pê bikin.

Lê ne diyar e ka dê Sûriye bêyî ku Israîl Girên Golanê lê vegere, bi Israîlê re rûne an na. Li gorî çavdêrên siyasî di mercên heyî de îhtîmala hevdîtin û diyalogê di navbera Israîl û Sûriyeyê de zêde ye. **BONN**

www.arsivakurdi.org

# Îşkenceya lê hatiye kirin vegot

**Siyasetmedara kurd Leyla Zana cara yekemîn îşkenceya lê hatiye kirin vegot û zordariya li çar welatên parvekerên Kurdistanê li gelê kurd kiriye anî ziman. Leyla Zana îşkence wiha vegot: 'Ez hatim tazîkirin û ceryan dan wicûdê min'**

**I CANN ZEKÎ** - OSLO / ANF

Siyasetmedara kurd Leyla Zana bîranînên xwe yên girtîgehê vegotin. Zana li Osloya Norwecê beşdarî konferansa bi navê 'Hêza Azadiyê û Esaleta Mirovahiyê' ya ji aliyê Foruma Freedomê ve hatiye lidarxistin bû û yekemîn car serboriyên xwe yên di zindanê de parve kirin.

Leyla Zana di axaftina xwe de anî ziman ku wê bi baweriya ji bo azadiyê li hemberî îşkenceyê kariye li ber xwe bide û wiha got: "Di odeya îşkenceyê de bûm. Hem bi pehînan li min dixistin û hem jî ji min dixwestin ku xwe tazî bikim. Li aliyekî min li ber xwe dida û li aliyekî jî bêwatebûna xwenuxamtina di hucreyê de difikirîm."

**'Xwîna zarokan herikî...'**

Zanayê di axaftina xwe de pûxteya qewimînên li Kurdistanê ku lê bûye şahid anî ziman û wiha dirêjî da gotinên xwe: "Ji kîjanê dest pê bikim? Car bû, li ba min hevalên min ên têkoşînê hatin qetilkirin. Car bû, em qalmecal bûn ku goran vekin. Car bû, ji cesedên parçeparçe bûyîn cesedekî pêk bînin. Car bû, xwîna zarokan herikî nava destên min."

Zanayê ku piştî anî ziman bi baweriya xwe ya ji bo azadiyê kariye li hemberî zilm û zordariyê li ber xwe bide, qala mayîna xwe ya di hucreya Midûriyeta Polîsan a Amedê de kir. Zanayê anî ziman ku ew di 26'ê tîrmeha 1988'an de hatibû binçavkirin û di hucreyeke ku dişibiya tabûtê de hatiye hiştin. Zanayê zilma ku di hucreyan de lê bûye şahid bi van hevokan anî ziman: "Ji hucreyên li qeraxên hucreya min qîrînên ji ber îşkenceyê bilind dibûn erşan... Çi mabû ku me ji destê faşîzmê bi çavên xwe nedîtiye? Navê rejîmê çi be bila bibe, maskeyên xwe guhertibûn û bi mîlyonan mirov daqurtandibûn, wekî hovan. Vê carê jî destên wê li Kurdistanê, li Tirkiyeyê bûn."

**Faşîzma dewleta tirk**

Siyasetmedara kurd Leyla Zanayê got ligel ku navê dewletê yê di Makeqanûnê de wekî 'dewleta demokratîk a hiqûqê' hatiye gotin, faşîzm ketiye nav îdeolojiya wê û qala derbeyên leşkerî yên ku ji 10 salan carekê pêk hatîn kir.

Leyla Zana bi bîr xist ku dema derbeya 12'ê Îlonê pêk hatî, ew hê 19 salî bû û ducanî bû. Zanayê di axaftina xwe de qala serdagirtina mala xwe jî kir û agahiyên ji wê demê dan. Zanayê anî ziman ku kesên digotin ez kurd im û mafên xwe dixwazim bûne hedef û wekî potansiyela sûc hatine dîtin.

Zanayê anî ziman ku kurd ne bi tenê li Tirkiyeyê li Sûriye, Iraq û Îranê jî rastî heman muameleyê hatine û bi bîr xist ku îro jî li Îranê kurd ji ber ku mafên xwe yên demokratîk dixwazin tên darvekirin.

**'Ez tazî kirim û ceryan dan min'**

Zana piştî dayîna van agahiyên giştî di axaftina xwe de îşkenceya ku di hucreyan de lê rast hatiye yekemîn car vegot: "Bi hêza ku min ji xeyalên xwe digirt li ser piyan dimam. Di demeke ku min muhasebeya xwe dikir de derî vebû. Ji xeyalên xwe veciniqîm. Dibe ku ji xewê hişyar bûbûm. Du polîsan, ewilê destên min ji pişt ve girêdan, paşê jî çavên min girêdan. Gotin, 'bimeşe'. Di odeya îşkenceyê de bûm. Hem pêhn û şimaq li min dixistin û hem jî dixwestin ku ez xwe tazî bikim. Min hem li ber xwe dida û hem jî bêwatebûna xwenuxamtina di hucreyê de difikirîm. Bi derbeyên li min dihatin xistin ji hay diçûm. Dema min hay ji xwe bû, min dît ku hatime tazîkirin û dibin ava şid de me. Her aliyê min birîndar bûbû."

Zanayê gotinên ku polîsan di dema îşkenceyê de ji wê re gotine jî bi bîr xistin û wiha got: "Digotin biaxive, bi salen e tu li ber deriyên zindanan mirovan bi rêxistin dikî. Li ku binêrin te dibînin. Duh jî jin te bi rêxistin kiribûn? Tu qala kîjan mafî, mirov û kurdan dikî? Li vî welatî her kes tirk e. Tu dê vê yekê qebûl bikî. Divê ligel yên hundir te jî bişewitînin. Li Sedam binêrin û şukurdarê halê xwe bin." Zanayê anî ziman ku dema cara duyemîn ji bo îşkenceyê ew birine, dîsa hatiye tazîkirin û ceryan dane wicûdê wê.

Zanayê di dewama gotinên xwe de zilma Sedam jî bi bîr xist û hovîtiya ku gelê kurd lê rast hatiye yek bi yek rêz kir.

Zanayê piştî qala salên di girtîgehê de borandine kir, axaftina xwe bi agirê Newroza 2009'an bi dawî kir: "21'ê Adara 2009'an. Cih: Qada Newroza Amedê. Qîrînên ji hucreyan dihatin vê carê bûn bangewaziya mîlyonan û li qadan deng veda."


Leyla Zana

# Nexşeriya çareseriyê xwestin

Rêxistinên civakî yên demokartîk ên li Amedê têkildarî nîqaşên çareseriya pirsgirêka kurd daxuyandin ku divê nexşeya rê ya çareseriyê bê derxistin. Saziyan daxuyand ku çareseriyeke her du aliyan îkna neke derkeve holê jî nabe çareseriyeke rasteqîn.

Serokê Şaxa ÎHD'ê ya Amedê Muharrem Erbey diyar kir ku pirsgirêka kurd pirsgirêkeke entîk û polîtîk e. Erbey wiha axivî: "Bi taybetî operasyona li dijî DTP'ê, zêdebûna operasyonên leşkerî û hin pêkanînên din wekî em di pêvajoya şer de ne, tên meşandin. Ji bo ev şêlûbûn ji holê rabe divê dewlet helwesta xwe bi zalalî danê holê. Pêşengên siyasî yên kurd, Hikûmeta AKP'ê, partiyên temsiliyeta wan a polîtîk heye, sendîqa, sazî û dezgehên civakî divê li Enqeeyê konferansekê li dar bixin û di warê pirsgirêka kurd de modelekê derxin holê." Erbey derbirî ku lazime rewşenbîr bi Serfermandariya Giştî, Sersefîrxaneya Amerîkayê ya Enqereyê û PKK'ê re jî bikevin nav diyalogê.

**'Êdî roj hatiye'**

Serokê Odeya Bazgirganî û Pîşesaziyê ya Amedê Galîp Ensarîoglu jî bi bîr xist ku Serokomar Abdullah Gul di warê çareseriya pirsgirêka kurd de însiyatîf girtiye û ev tişt anîn ziman: "Ji bo jiyanek din a baştir divê herkes wezîfeya dikeve ser milan bi cih bîne. divê Tirkiye pirsgirêkên navxweyî çareser bike û ber bi derve xebatan bimeşîne. Êdî roja vê yekê hatiye. divê êdî bê çareserkirin. Elbete piştgiriya me dê destê hikûmetê bihêztir bike. Pirsgirêk dê li Meclisê çareser bibe û ji ber vê yekê wezîfeyek mezin dikeve ser milê Hikûmetê."

Serokê Odeya Tabîban a Amedê Selçuk Mizrakli, destnîşan kir ku axaftinên di der barê çareserkirina pirsgirêka kurd de ji meqama Serokomariyê û peyamên ku ji Navenda PKK'ê jî ve hatin, nîşan dide ku aliyê dewletê gavên erênî bavêjin, ew ji bo çareseriyê pirsgirêkê amadene û ev yek jî ji bo Tirkiyeyê şansek e. Mizrakli, derbirî ku dema avakirina çareseriyê de qedemeyên çareseriyê diyarin û ev tişt gotin: "Di encemê de pêwiste tevahî rêyên çareserkirinên bên bi kar anîn. Ku ev riyên çareseriyê neyên bi kar anîn dê di pêşerojê de guhên wê yekê li stûyê me bin. divê alî jî neyên tunehesibandin. Li ser tunehesibandina aliyekê tu pirsgirêk çareser nabin. Biryara bêçalaktiyê ya her du aliyan dê bibe gava yekemîn."

**'DTP aliyek e'**

Serokê Şaxa Egîtîm Sen a Amedê Abdullah Karahan jî, destnîşan kir ku ji ber vînek bi dilsozî pirsgirêkê bigire dest tûneye tengasî tên jiyîn û wiha got: "Ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd vînek bi dilsozî tûneye. Di vê mijarê de DTP aliyeke û xwe li gel aliyê yên vî karinê nîşan dane."Serokê Şaxa Tum Bel-Sen Şube Edîp Yaşar jî, diyar kir ku tevahî derdorên heskiriyên aşîtiyê ji bo çareserkirina pirsgirêkê lazimê têbikoşin û ji bo aşîtiyêk bi rûmet pêwiste di nav hewldanan debin û wiha got: "Tirkiyê di nav xwe de ziman û çandên çûda werdigre. Ev jî di warê rengan de dewlemindiyek e. Lazime ji cudahiyan neyê tirsîn." **AMED / DÎHA**

# KNK deh saliya xwe pîroz dike

**Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê di 24'ê gulanê de 10'emîn salvegera damezirandina xwe pîroz dike. Bi munasebeta salvgerê Konseya Rêveber a KNK'ê banga yekîtiyê li tevahiya hêz û kesayetên kurd kir.**

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) ku bi mîsyona avakirina yekîtiya netewî ya kurd hate damezirandin di 24'ê gulanê de 10'emîn salvgera damezirandina xwe pîroz dike.

KNK deh saliya xwe 24'ê gulanê li navenda xwe ya li Brukselê, bi resepsiyonekê pîroz dike. KNK bi daxuyaniyekê ragihand ku kurd û kurdistanî vexwandî ne û dikarin pîrozbahiyên xwe bi hatin an jî rêkirina mesajan bi cih bînin.

Têkildarî 10'emîn salvgera damazirandina KNK'ê Konseya Rêveber duh daxuyaniyeke nivîskî belav kir. Di daxuyaniyê de hate bibîrxistin ku KNK bi armanca yêkitiya neteweyî li 24'ê gulana 1999' ê hate damezrandin. 'KNK rêxistina Kurdistanê ye' Di daxuyaniyê de hate destnîşan kirin ku hewcehiya yêkitiya neteweyî ji kûrahiya salan were heye û ev daxwaze îro jî dom dike û ev nirxandin hate kirin: Heta ku nîrê kolonyalîzmê tête şikandin, Kurdistan tête rizgar kirin, xelkê kurd û hemû Kurdistanî azad dibin, ev daxwaze dê daîm hebe. Ji daxwazên salan jî tête têgihiştin ku neteweyê Kurd û Kurdistaniyan çu cara ev daxwaza giştî sar û sivik nekirine, di her şert û delîveyî da bilind kirine û bihayekî mezin dane vê armancê.

KNK wekî rêxistineke seranserî ya Kurdistanî di demekî wisa da hate ava kirin ku pêdiviya bi yêkitiyê, di dereceya lezîniyeta man û nemanê da bû. Terkîba KNK'ê her ji destpêkê were bi temsîliyeta piraniya maqûl ya kurd û Kurdistaniyan pêkhat. KNK bi avabûn, terkîb, program û xebata xwe ve xwast bibe zemînekî saxlem yê yêkitiya neteweyî ku prosesa yêkitiya herî fireh ya ku tête xwastin, gav bi gav bête vehûnandin. KNK'ê di vî warî da gavek avêt û vê hewildana xwe didomîne." **BRUKSEL / ANF**

# Sebahat Tuncel: Gelê me dê li vîna xwe xwedî derkeve

Cîgira Heverokên DTP'ê û Parlamentera DTP'ê ya Stenbolê Sebahat Tuncel, ji bo mîtînga di 24'ê gulanê de bi dirûşma "DTP'ê bêdeng nekin, çekan bêdeng bikin' li Stenbolê pêk bê banga tevlêbûnê kir. Tuncel, bang li her kesî kir ku xwedî li vîna di 29'ê Adarê de derketî holê derkeve.

Tuncel, anî ziman ku ew dê di mîtîngê de li dijî êrîş, girtin û zordariyên li ser DTP'ê biqêrin û wiha got: "Ev mîtng ji bo pira navbera gelê kurd û tirk pir bi wate û girîng e. Gelê kurd di hilbijartina 29'ê adarê de dengê xwe da DTP'ê û berpirsiyariya çareseriyê li ser DTP'ê bar kir. Lê belê li şûna ku DTP kar û mîsyona xwe bi cih nîne êrîş li ser DTP'ê pêk hat. Ger ku pirsgirêka kurd neyê dîtin û bê înkar kirin çareserî pêk nayê."

**Çima Stenbol?**

Tuncel, bal kişand ser girîngiya mîtînga Stenbolê û wiha got: "Em di 23'an de li Wanê û di 24'ê Gulanê de li Stenbolê mîtîngan pêk tînin. Çareseriya pirsgireka kurd, ne tenê berpirsiyariya gelê kurd e, her wiha bi qasî kurdan tirk jî berpirsiyarê çareseriya vê pirsgirêkê ye. Ji bo çareseriya vê pirsgirekê û aramiya Tirkiyeyê divê gelê tirk jî têkevin bin berpirsiyariyê."

Li ser mijarê Tuncel ji bo beşdariya mîtîngê bang li her kesî kir û wiha axivî: "Di dîrokê de kurd rastî gelek êrîş û neheqiyan hatine. Lê belê tu carî têkoşîn û berxwedana xwe ranewestandine. Her tim berxwedana xwe pêş xistine. Ji ber vê yekê em gelê xwe roja 24'ê Gulanê dawetî qata Mîtînga Qada Çaglayan dikin. Em bang li hemû gelê xwe dikin ku xwedî li vîna xwe derkeve."

**Hêza xwe li Stenbolê dicivînin**

Rêxistinên DTP'ê yên Edîrne, Tekîrdag, Bursa, Kocaelî, Kirklarelî û Balikesîrê jî dê beşdarî mîtînga bi armanca şermezarkirina zordariyên li ser DTP'ê û çareseriya pirsgirêka kurd pêk tê, bibin. Serokê DTP'a Kocaeliyê Alî Kavak diyar kir ku ji bo beşdariya mîtîngê dest bi xebatan kirine û dê ligel Platforma Ked û Demokrasiyê, sendîqa, partiyên siyasî û rêxistinên civakî re beşdarî mîtîngê bibin. Serokê DTP'a Bursayê Huseyîn Dîken jî diyar kir ku ji bo mîtîngê li navenda Bursayê û navçeyên wê jî xebatan didomînin. Dîken ev tişt gotin: "Em ê bi awayek girseyî beşdarî mîtîngê bibin."Serokê DTP'a Balikesîrê Hîkmet Karataş jî diyar kir ku bi armanca şermezarkirina zordariyên li ser DTP'ê dê bi coş beşdarî mîtîngê bibin. Serokê DTP'a Edîrneyê Beşîr Belke û Serokê DTP'a Kirklareliyê Abdullah alkiş jî daxuyandin ku dê bi coş beşdarî mîtîngê bibin.

**Bernameya mîtîngê aşkera bû**

Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna, Parlamenterên DTP'ê Sebahat Tuncel, Pervîn Buldan, Bengî Yildiz û Parlamenterê ODP'ê Ufuk Uras û bi sed hezaran kes dê beşdar bibin. Girse dê saet di 10.00'an de li ber Perpayê kom bibe û saet di 11.00'an de bi panqarta "DTP'ê bêdeng nekin, çekan bêden bikin" ber bi Çaglayanê ve dest bi meşê bike. Pîştî axaftina Hevseroka DTP'ê û yên nûnerên saziyên sivîl dê mîtîng bi stranên Koma Agirê Jiyan û Îbrahîm Rojhilat bidome. **STENBOL / DÎHA**


Sebahat Tuncel

## Wan ji bo mîtîngan amade ye

Xebatên mîtînga DTP bi armanca şermezarkirina zordariyên li ser partiyê bi slogana, "DTP'ê bêdeng nekin, çekan bêdeng bikin" di 23'yê gulanê de li Parqa Çandê ya li rex Keleha Wanê pêk tê, berdewam dikin. Ji bo mîtînga xebatên wê bi lez tên meşandin, Walîtiya Wanê destûra fermî da.

Li ketin û derketina Wanê û li gelek cihên bajar jî afîş û panqartên der barê mîtîngê de hatin daliqandin. 100 hezar belavokên derbarê mîtîngê de ji aliyê DTP'a Wanê ve hatiye amadekirin, dê bên belavkirin. Belavokên hatine derxistin, wê li navend, navçe û gundan bên belavkirin. Nêzî 300 kes ku amadekariya mîtîngê dikin, êvaran civînên bi girseyî pêk tînin û banga ji bo beşdariya mîtîngê dikin. Ji bilî xebatan, amadekariyên ji bo pêşwazîkirina girseyê ku ji bajarên herêmê tên jî, didomin. Komîteya Amadekariyê ya Mîtîngê, ragihandin ku wê li 3 noqteyan girseya ku ji bajarên herêmê tên pêşwazî bikin. Hate diyarkirin ku wê li ser riya Colemêrg, ketina navçeya Artemêtê û riya Erdîşê, peywirdar rawestin û kesên ji bajarên din tên, bînin qada mîtîngê. Ji bilî navenda Wanê, li navçeyan jî xebatên mîtîngê tên kirin. Di serî de Elbak, Bêgirî, Qerqelî, Çaldiran û Erdîşê, li 11 navçeyan xebatên mîtîngê hatin xurtkirin. **WAN**

# Gotin

Erxewan



Arjen Arî
arjenari99@yahoo.com

Omer Dilsoz, Omerê bi qasî paşnavê xwe ji mêlakê dilsozê nivîs û xwînerê xwe beriya romana 'Neynika Dilî, dîwaneke helbestan bi navê Bila Gotineke Me Jî Hebe* weşand, û gotina xwe bi riya nivîsê, bi şêweyeke çak, bi rameki pak; di newaya stranekê de ji me re vegot.

Weke gotina her nivîskarî gotina Omer jî 'gotegot' bû û ji ber ku berî nivîsê; berî Hamûrabî gotina xwe li ser berdê reş bide neqişandin, berî ku xetkêş Destana Gilgamiş gotin bi gotin hilgirin ser qahfikên kîlî, û berî Mûsayê mizgîndarê 'axa wahdkirî' li Tûrî Sîna berzûrî Rebê xwe bibe û bibêje 'Xwezî niha ev peyv yek bi yek ketibûna bin nîrê nivîsê'; ya her kesî gotin bû û gotin hebû…

Weke gotina her kesî hebû, gotina her nivîskarî jî heye ku dibêje û xwe xwe gotina xwe dixe bin nîrê nivîsê, û wê, berhemkî dispêre refikeke geliyê zeman …

Zeman; lehiya ku ketûber her tiştî; qirş û qal, husn û cemal, can û mal dixe ber devê pêlên xwe û li ber xwe dibe; pê re gotina herî pîrozwer, ya herî efsûkar û watedar jî ji devê jêderketî digire û berê wê dide rêya çûn û nehatinê…

Gotin ji roja ku bi lêv bûye û hatiye gotin, di hêlana zeman de xwe hêlikandiye…

Zemanê ku her tiştî sersam û sewsî dike, carinan bi sêhra gotinekê serî li wê bi xwe geriyaye, û wê, yanî zeman gotinin mîna bitikên di pêçekên de bi delalî xwedî kirine, mezin kirine, kirinê mal û milkê her zemanî…

Zeman însan bi xwe, ji bo xwe ew ji hev dariştibe û navê rojan, yên meh û salan lê kiribe jî; bi tu rengî nekariye rişma wê ragire, biwestîne, wê li cihekî bisekinîne, bihedinîne…

Ji ber vê şûmiya zeman em li cihê xwe rawestin, di germahiyeke heyva pûşperê de bo vehêsaneke hênik em pala xwe bidin siya darekê û vekevin; dîsa jî, zeman, li derveyî me, bêyî me, digel me diherike, kêlî bi kêlî me ber bi sînorê tunebûne ve dibe…

Digel ku weke wendayiyên ji nava me 'wenda', yên ku îro jî her şemî li Amedê li Parka Qada Beza Hespan, hûr gir bi dilekî mişt bi hêvî li wenda û wendayiyan ji nava xwe dipirsin û digerin; zemanê dermanê her birînê, ji newala gotinê gotinan vedize, xef bike û hinan bibe jî; zemanê devgur, zemanê ku her tiştî mîna patozê dikare bicû, bihêrifîne û hûr hûrî bike jî, dîsa bi yek tiştî nikare: Bi hêza 'gotin'ê!

Gotin çi bi riya gotinê, çi bi riya nivîsê hebû/heye/ dê hebe.

Bi qasî destnîşankirina teqez ya li jor, ev çend aşkera ye ku gotin jî dimire!

Bi qasî ku dimire, û weke her bûneweri pahra mirinê ye gotin jî, gotin, gotina çak, gotina resen, gotina delal, gotina ciwan… weke vê gotina pêşiyan, 'Ga dimire çerm dimîne, mêr dimire nav dimîne'; di gelek qonaxên dijwar re dibihure û qesta me dike…

Ev qest xwe li nemirtiyê girtin e!

Jixwe her nivîskar bi qasî hêza şûrê ku bi gotinê li zeman kişandiye, serî li zeman û dewranan hejandiye, û berê peyvê xwe daye konaxên bêdawî…

Gotin an ji jêderka mêjî mişt aqil e, an jî her nuqt ji qulzema ji hezê, ji kahniya dil e.

Gotinên ji kahniya dil gotinine tîhnegerm, nermehevrîşmîn û fûrek in.

Her gotin, her gotina ji dil bayê baweriyê û delaliya newayî hildigire, û mîna sureke nesîmî; şek, hênik, tenik diwirwire, û weke çivîkê ku ji hêlînê bifire û qesta şaxa darê bike, wisa firok, fûrok, û bîhn-şimamok e…

Weke vê bendehelbestê:

*Lûleper*
*Li beyarekê, li taldeyeke veder*
*Bi kîjan êşê vedihewînî bêhna xwe*
*Ji kîjan keserê,*
*Ji kîjan rondikê,*
*Ji kîjan dilopa xwînê;*
*Ji dilê kê diniqutî?*

*Lûleper…*
*Êşan nede der*
*Ev, taldeya veder*
*Ew, wargeha bêserober*
*Ev, rûgeha rengqemer*
*Ew, dilgeha birîn bi xencer…*

*Lûleper*
*Demsal di nava demsalê de, li çaleke bêbinî*
*Kêliyên herî watedar dinixumîne*
*Kêliyên ji temenê evîna min a talankirî*
*Evîna min a bizmêk lêkirî*
*Evîna min a di nava wan kêliyan de jibîrkirî***

… … … …

*Bila Gotineke Min û Te jî Hebe, O.Dilsoz,Wş.Berçem,2006

**Ji heman dîwanê helbesta bi navê Lûleper

# A dimîne

*wek şewqek şewl didî*
*çavên min dipilpisin*
*wek avê diherikî dilê min*
*honik dibim.*
*berf dibare hundirê min*
*di*
*mista min de kenê te*
*hilma min germ dike*
*tu sosin î*
*çavên min de vedibî*
*çavên min bi te*
*bi te tijî dibe*
*û tu çûyî*
*wexta tu ji min xeyidî*
*rojên baran*
*û bêhna axê jî*
*dev ji min berda…*
*ez mam di nav çola*
*gotinan de*
*lê newşê te yê dilevîn*
*pey min berneda.*
*û tu nehatî!*
*xwezî tu kilamek bana li*
*cem min*
*min bisitira, te jî guhdar*
*bikirana*
*lê tu nayê*
*sindoqa diya min de*
*şeyê te yê şikestî*
*ku porê te lê lefiyaye*
*min derxist û ta bi ta*
*min şe kire hêviyên xwe*
*zanim dîsa jî*
*de tu nêy…*
*te digote ez diçim*
*pêşî çavên te hênijîn*
*û pêy te man birînên*
*vekirî*
*çûndin behnek e xwişka*
*min*
*a dimîne difetise nav wê*
*behnê de..*

**BESÊ OZER**





balekani@hotmail.com
Îkram BALEKANÎ

# 'Dilê Kurdan'

Gelo dema behsa dilan dikin, çi tê bîra we? Ez naxwazim li ser navê we qise bikim, ji ber ku naxwazim bibim qisebêj, lê ger ez hewl bidim texmîn bikim, ez ê bêjim, dema behsa dilan dikin, di serî de dildarî tê bîra we. (Ê heyran, xuya ye hûn bi xwe dildar in, loma dildarî tê bîra we.) Gotinek heye dibêjin; kî bi xwe çi be, dibêje qey her kes wisa ye. Yanî yek diz be dibêje qey dinya hemû diz e, yên aştîxwaz bin, dibêjin qey her kes aştîxwaz e (wekî kurdan), yên şerxwaz bin, dibêjin qey her kes şerxwaz e (wekî tirkan), yên wekî we dildar jî dibêjin qey her kes dildar e. Heyran xwe hêrs nekin, min xeta kir min got hûn dildar in, ma qey min derew kir haşa hizûra we, tobe tobe. Heyran ma dildarî çi ye? Ma qey min got hûn evîndar in! Min tenê got; hûn dildar in, ma kesê/a ku dil hebe, ne dildar e. Yên ku dil hene jixwe dildar in. (Lê ne li gorî Zana Farqînî, li gorî Babe Ikramê Balekanî.)

Baş e, em werin ser mijara xwe hêj nebûye tirşik. Ma dema behsa dilê kurdan tê kirin, çi tê bîra we? Ezê vê carê bibim nûnerê hestên we, (yanî ezê bibim kevçiyê nav beroşê) û li ser navê we xeber bidim. Belê dema behsa dilê kurdan tê kirin, gelek tişt têne bîra we. Dilnazikî, dilnizmî, dilteniki, dilşewatî, dilterî, dildarî, dilnermî, rastî, durustî, camêrî, canejinî, coş, heyecan, mêvanperewrî, ma ez ji ku zanim, her tişt tê bîra we (belkî). Lê ez behsa wî dilî nakim, min dilekî din ê kurdan dîtiye. (Min di nivîsa hefteya derbasbûyî de dinyaya kurdan jî keşf kiribû…)

Zehmet nebe, bîstekê li ser bifikirin, ka dema xwarinekê bidin we û hûn têr bin, yan we berê xwaribe, yan hûn jê hez nekin, hûn çi dibêjin? Sedîsed hûn dibêjin; dilê min naçê. Gelo ma mirov bi dilê xwe dixwe ku dilê mirov herê yan neçê. Lê em wisa dibêjin. Ev jî cudahiya bingeha zimanê me nîşan dide. Çawa ku di "Dinyaya Kurdan" de jî me dît, ji bo rewşa hewayê "Dinya" bi kar dianîn, ji bo xwarinê jî dil bi kar tînin. Gel û neteweyeke ku ji bo rewşa hewayê bêje, dinya xweş e, dinya sar e, dinya germ e, jixwe ji bo xwarinê jî ku bêje, dilê min diçê, yan dilê min naçê, normal e. Jixwe di tu zimanekî din de ez rastî tiştekî wiha nehatime ku dil biçe tiştekî. Ya tikan qet behs nekin, ya tirkan ecêbtir e. Canê wan naxwaze. Lê ya anormal ev e ku wê rojê yekî îdia dikir ku kurd bi dil dibînin. Ya rastî ez pêşî şaş bûm, min got ku wisa be, ne hewce ye em berçavkan bidin ber çavên xwe. Lê wî helbesta Seydayê Cegerxwîn a bi navê "Gulfiroş" mînak da û xwest min îqna bike. Êdî ez gihîştim vê qenaetê (encamê) ku me dil şaş fam kiriye, ew dilê ku Cegerxwîn behsê dike, gulan nabîne, belku ew dil tê firotin…

*" Ez ji xew rabûm, gulfirosek dî,*
*Pir gelek sa bûm, gul bi dil didî.*
*Gul bi dil didî.*
*Hebû me yek dil, tev jan û kul bû,*
*Ne bûme bawer, gul bi dil bidî.*
*Gul bi dil bidî.*
*Bazar me kir go, ser bi ser nadim,*
*Ê gulperest bî, can û dil didî.*
*Dil bi kul didî.*
*Min go kî didî. Can û dil bi gul,*
*Go ev bazar e, dil bi kul didî.*
*Dil bi kul didî.*
*Min can û dil dan, dil kiriye qêrîn,*
*Go ho Cegerxwîn, dil bi gul didî.*

(Di vir de Seydayê Cegerxwîn, can û dilê xwe bi gulekê difiroşe, lê dil dike qêrîn…) Yanî gulfiroş gulan dide dil. Di rêzika „Gul bi dil didî." De, ev "Didî" ne ku ji lêkera "Dîtinê" belku ji lêkera "Didan"ê tê. Ez zêde serê we neêşînim, min bi xwe fam nekiriye, ez dibêjim qey hûn jî fam nakin, jixwe hûn dizanin mesele çiye.

HAWARA EYŞO

EYŞO NIFIRAN DIKE




NIFIRÊN EYŞO QEBÛL BÛN




ŞOPANDINA KORANE




HELWESTA LI DIJÎ DTP'Ê



# 'Mihrîcana Amedê bû marka'

**Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê ku her sal bi çalakiyên wekî şano, sînema, muzîk, pêşangeh tê li darxistin û dehan hunermend tên bajar û bi dehan çalakiyên hunerê pêk tên îsal cara 9'an tê lidarxistin. Şaredar Baydemîr got ku Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê bûye marka**

Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr, di daxuyandina bernameya mîhrîcanê de diyar kir ku Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê bûye marka. Baydemîr, anî ziman ku di çarçoveya mîhrîcanê de dê panel, konser, atolye û pêşandanên filman pêk werin û di dawiya mîhrîcanê de jî dê ji bo çareseriya pirsgirêka kurd meşa aştiyê bê lidarxistin.



Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr, bernameya 9'emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê ku di 27-30'ê gulanê de pêk tê, aşkera kir. Baydemîr li Salona Resepsîyona Parka Sumerê bi rojnamevanan re civînek li darxist. Di civînê de şaredarên navçeyên Sûr, Kayapinar, Yenîşehîr, Baglar û nûnerên çapemeniyê yên herêmê amade bûn. Baydemîr, di civînê de diyar kir ku sal bi sal naverok û cehwerê mîhrîcanê baştir û rengîntir dibe û wiha got: "Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê ku dewlemendiya potansiyela çand û hunerê bi cîhanê dide nasîn û bi qada gerdûnî ve parve dike, edî bûye wekî markayekê." Baydemîr, diyar kir ku êdî mîhrîcan dibe wekî sazîbûnekê û anî ziman ku di 6 qadan de xebatan dimeşînin. Baydemîr, bal kişand ser xebatên sînemayê jî û anî ziman ku filmên sînemayê dê werin pêşandan û ev yek heyecanê dide wan.

**'Niha dema aştiyê ye'**

Baydemîr, diyar kir ku dê di roja yekem a mîhrîcanê de dê pêşengehên wêne, resim, guhdarîkirina muzîk û şanoyê pêşkêş bikin. Baydemîr naveroka mîhrîcanê wiha got: "Mîhrîcan dê 4 rojan bidome. Di roja dawî ya mîhrîcanê de dê hunermendekî surprîz konserê bide. Niha dema mîhrîcan, aştî û demokrasiyê ye. Mîhrîcan dê bi meşa aştiyê bi dawî bibe." Baydemîr, piştî axaftinê pirsên rojnamegeran jî bersivandin.

**Çalakiyên cur bi cur pêk tên**

Di roja yekem a mîhrîcanê de dê pêşengeha wêneyan, resim, guhdarîkirina muzîk û şanoyê bê li darxistin. Di roja 2'yem de panela bi mijara "Jin, namûs û azadî" ku Rojnameger Yuksel Genç, Şaredara Dêrikê Çaglar Demîrel, Sekretera jin a KESK'ê Songul Morsumbul, Parlamentera DTP'ê Ayla Akat Ata, Hîndekara Zaningeha Bogaziçiyê Alk. Doç. Nazan Ustundag beşdar dibin, tê lidarxistin. Dîsa di heman rojê de dîwana dengbêjan dê bê lidarxistin û piştre jî konser tê dayîn. Seat di 19.00'î de meşa 'Xewna azadiya çand û hunerê' ji Deriyê Rihayê heta Deriyê Çiyê tê lidarxistin. Di roja dawî de jî konser, şano, sînema û xebatên atolyeyan têne lidarxistin.

Di roja dawî ya mîhrîcanê de panela mijara wê "Modela çareseriya demokratîk a Pirsgirêka Kurd" dê bê lidarxistin û piştre konsera fînalê were lidarxistin. Piştî konserê ji bo çareseriya pirsgirêka kurd meşa ji bo aştiyê dê bê lidarxistin. **AMED**




# Cejna Ziman bi çadira ziman û panelan dewam dike

Çadira Ziman ku bi boneya Cejna Zimanê Kurdî li Wanê hate vekirin, eleqeyeke mezin ji gel dibîne. Nivîskarê kurd Hemîd Dilbihar îro li çadirê pirtûka xwe ji wêjehezan re îmze kir.

Eleqeya li hemberî Çadira Ziman a ji hêla Şaxa KURDÎ DER'ê ya Wanê ve bi boneya Cejna Zimanê Kurdî hatiye vekirin, didome. Di çarçoveya çalakiya Çadira Ziman a heta 22'yê gulanê didome de nivîskarê kurd Hemîd Dilbihar pirtûka xwe ya bi navê, "Piştî Tu çûyî" îmze kir. 8 weşanxaneyên kurdî 5 hezar pirtûk li çadirê pêşkêş dikin.

**Li Colemêrgê panela zimanê kurdî**

Li Colemêrgê, ji hêla TZPKurdî ve di çerçoveya Cejna Zimanê Kurdî de li Salona Civînê ya Şaxên Platforma KESK'ê ya Colemêrgê, panela zimanê kurdî hate lidarxistin. Mamosteyê zimanê kurdî Evdila Bor, Mamoste Serdar, Rojnamevan û Nivîskar Omer Dilsoz wekî peyvker beşdarî panelê bûn. Panela ku rastî eleqeyeke mezin hat, bi rêzgirtinê dest pê kir. Evdila Bor bal kişand ser pêkutiyên li ser zimanê kurdî û destnîşan kir ku divê li dijî van pêkutiyan gelê kurd jî bi xwedî derketina li zimanê xwe bersivê bide. Bor, di axaftina xwe de li ser wêje û dîroka zimanê kurdî rawestiya û wiha got: "Pêkutiyên li ser zimanê kurdî ku zimanekî gelek berfireh e, didom in. Em van pêkutiyan şermezar dikin." Nivîskarê kurd Omer Dilsoz jî got hebûna gelekî bi ziman, çand û wêjeya wê diyar dibe. Dilsoz, da zanîn ku wêje û zimanê kurdî xwedî dewlemendiyeke pir mezin e. Dilsoz, destnîşan kir ku ji ber vê ji bo parastin û pêşvebirina zimanê kurdî divê gelê kurd li hemû qadan xwedî li zimanê xwe derkevin. Mamoste Serdar jî got divê gelê kurd heta zimanê kurdî nexe bin ewlehiya makeqanûnê divê dev ji têkoşîna xwe bernede. Mamoste Serdar, anî zikan ji bo zimanê kurdî tune nebe, zarok bên perwerdekirin û bi taybetî jî divê di bazirganiyê de bê bikaranîn. Di dawiya panelê de jî nivîskar Omer Dilsoz pirtûkên xwe ji xwendevanên xwe re îmze kirin. **WAN - COLEMÊRG**

# Li Cannesê kêfxweşiya derhênerê kurd

**MURAT AKTAŞ** - CANNES / ANF

Di Mîhrîcana Fîlman a Cannesê de îsal ji bilî fîlmê Bahman Ghobadî yê bi navê 'Kes Behsa Pisîkên Îranê Nake', kurtefîlmê Şahram Alidî yê bi navê 'Sirta La Gal Ba' û kurtefîlmê derhêner Akram Kiro yê bi navê 'Havîna Sor' di beşa Kameraya Zêrîn de hatin nîşandan. Derhênerê kurd Akram Kiro anî ziman ku ji ber li cihekî mîna Cannesê fîlmê wî hatiye nîşandin kêfxweş e.

Di fîlmê Akram Kiro de jiyana koçberekî kurd ku li Almanyayê dijî tê vegotin. Her wiha pirsgirêkên ku kurd li welatê xwe pê re rû bi rû dimînin jî di fîlmî de cih digirin. Derhêner Akram Kiro bi lêv kir ku ji ber zextên dewleta Sûriyeyê hem zaroktî , hem ciwanî û hem jî mezintiya kurdên li vir dijîn bi pirsgirêkan re derbas dibe. Kiro destnîşankir ku fîlmên bi van mijaran dikişîne û pirsgirêkên ku kurd di zaroktiya xwe de dijîn û ji ber direvin tên welatên wekî Almanyayê jî didomin.

Derhêner li ser mijara zextên zaroktî û ciwaniyê projeyan amade dike û li ser mijara koçberiyê radiweste. Kiro bi lêv kir ku di van mijaran de gelek projeyên wî hene. Derhêner bi xwe jî ji Îranê koçî Beyrûdê kiriye. Piştî ku salekê perwerdeha hiqûqê digire dest bi hunera şano û sînemayê dike û di van beşan de perwerdehiyê dibîne.

Derhêner di sala 2002'an de koçî Almanyayê dike û xebatên xwe yên li ser sînemayê li vir didomîne. Derhêner heta niha bi kurtefîlmên wekî 'Gonglik', 'Kevir Li Ser Kevir' û 'Havîna Sor' ve beşdarî gelek mîhrîcanan bûye. Derhêner piştî ku encamên baş di van mîhrîcanan de wergirt dixwaze di pêşerojê de fîlmekî metrajdirêj bikişîne.

Derhêner diyar kir ku niha li ser fîlmê bi navê 'Li Xekat Bi Xidan' dixebite û saziyên Almanyayê jî piştgiriyê didin kişandina fîlmî. Kiro destnîşan kir ku çend roj berê ji bo projeya wî biryara piştgiriyê hatiye dayîn û kêfxweşiya xwe anî ziman. Mijara fîlmê bi xêzkirina sînoran ve parçebûna Kurdistanê ye û di fîlmî de zextên li ser kurdan tên vegotin.

Derhêner Kîro anî ziman ku di salên dawî de sînemaya kurd gelek bi pêş ketiye û di mîhrîcanê de dîtina fîlmên ji welatên wekî Sûriye û Tirkiyeyê zehmet e lê fîlmên kurdan bi rihetî di van mîhrîcanan de cih digirin. Di mîhrîcanê de 2 fîlmên derhênerên ji rojhilatê Kurdistanê û ji bakurê Kurdistanê jî fîlmê derhênerê ciwan Firat Okçuoglu tê nîşandan.

# Gîtara Bê Têl û Mijarên Miqro

Li pirtûkxaneya kurdî 2 pirtûkên nû zêde bûn. Nivîskar Cîhan Roj ku beriya niha bi nivîsandina helbest û çîrokan derketibû pêşberî xwendevanan niha jî bi 'Gîtara Bê Têl' derket pêşberî xwendevanan. Her wiha nivîskar Çiya Mazî bi pirtûka çîrokan ya bi navê 'Mijarên Mîqro' gihîşte hezkiriyên pirtûkan.

**Ji Cîhan Roj 'Gîtara Bê Têl'**

Beriya niha pirtûkên Cîhan Roj yên helbest û çîrokan hatibûn weşandin niha jî romaneke bi navê 'Gîtara Bê Têl' weşand. Pirtûk ji nav weşanên Do derket.

Salên şer, salên dijwar, cih Mêrdîn. Di dem û ciheke wisa de romana 'Gîtara Bê Têl' tevî lehengê xwe derketiye pêşberî romanhezên kurdî. Di romanê de yekserîtiya jiyanê çiqas li ber çav hatibe girtin ew qas jî nivîskar girîngî daye hêlên sivik ên jiyanê.

Karakterê sereke yê romanê carinan mîstîk e, carinan di nav haleke surreal de ye û carinan jî di nav jiyana realîst de bi rihekî herî sivik dijî; rojekê dengê mewlûda bi kurmancî bi ser wî dikeve. Ew deng dibe destpêkek. Sewta wî dengî dibe sedem ku ew careke din bi rabirdûya xwe û bi jiyana xwe re rû bi rû bimîne; deşîfrekirina karakter dest pê dike…

Heya ku rastiyek xwe dide der; karakterê kurd ku bijîşk e naxwaze terka Mêrdînê bike. Bi wî awayî problem dest pê dikin! Bi ser de jî rojekê gîtareke bê têl bi riya kargoyê tê ji evîndara bijîşk re. Alozî bêtir xwe didin der. Nivîskar Roj di romanê de carinan ji devoka Serhedê fêdeyê digire. Romana 'Gîtara bê têl' ku ji Weşanên Do derket yekemîn romana Cîhan Roj e. Li gor gotina nivîskar dema xwestiye nav li romanê bike li ser bi dehan navan fikiriye û di dawiyê de navê 'Gîtara Bê Têl' guncav dîtiye.

**Pirtûkeke çîrokan; Mijarên Mîqro**

Pirtûka çîrokan ya Çiya Mazî bi navê "Mijarên Mîqro" ji Weşanên Doyê derket. Heta hiha di gelek weşanan de çîrokên Çiya Mazî hatine weşandin. Ji van çîrokan yek jê jî bi navê "Mistek Jiyan" bûbû pirtûk û ji Weşanên Sî derketibû. Mazî niha bi pirtûkeke din a çîrokan, bi "Mijarên Mîqro" derket pêşberî xwendevanên xwe.

Nivîskar Mazî di 'Mijarên Mîqro' de jî alî teknîk û şêwazê ve guherîneke xwe nîşan dide. Çîrokên di "Mistek Jiyan" de ku piraniya wan li ser jiyana kurdan bû, di vê pirtûkê de bi piranî psîkolojî derdikeve pêş. Tiştên biçûk ku mirov lê heyirî dimînin an mirov bi wan tiştan dikevin astengiyên mezin û nikarin derkevin bi piranî bûne mijara çîrokên Mazî. Minak; kêzikek, xewna zarokekî, heste, dibistan û fikandina miroveki bûne mijara çîrokên wî.

Ji nav çîrokan di çîroka 'Dara Bihîvê' de xwendevan rastî kuştina jin û qîzan tê; di çîroka 'Şemo Şano' de hînbûna îşkenceyê ku mirov êdî demek tê îşkenceyê bi tiştekî nahesibîne xuya dike. Her wiha carinan mirov dibin wekî wehş û hirçan û bê rehm dimînin di çîroka 'Şahidî' de. Lehengê çîroka balkêş 'Dîmen xweş e' bi navê 'Brêz M.' zixtan li pîroziya dayikê dixe û dibêje "ez ji diya xwe hez nakim". 'Xewna Dawî', 'Tenûra mala şêx', 'Em', 'Ma ev jî nig in', 'Kekê mino zava', 'Dînamo' hin çîrokên din in ku di 'Mijarên Mîqro' de cihê xwe girtine. **STENBOL** *(diyarname)*

# Bîranîn



Serkan ŞÎTÎLAY
1982

*Em li quntara*
*Zagrosan in*
*Çar çavên me kanî*
*Çar çavên me avdanî*
*Û sêkuçê hûr dibe*
*Tevayê heyamên dûr*
*Di nav serdema gemar*
*û berze de*
*Her êvar…*

Em li hemberî bîranîna Serkan ŞÎTÎLAY û rêhevalên ku tevî wî ketin axê rêz digirin û bejna xwe ditewînin, ji malbatên wan re sersexiyê dixwazin.

**Hevalên wî Aydin Elçi, Hasan Çapadak, Dr. Ayhan Kavak, Serdar Şitilay, Vahyettin Sari, Nizametin Algunerhan, Nedim Ozalp û Turabî Kişin**

# 'Sedema komkujiyê pergala cerdevaniyê ye'

Saziyên jinan ên li Zankirtê lêkolîn kirin, çavdêrî û daneyên berhev kirîn wekî raporekê aşkera kirin. Di raporê de hate daxuyandin ku sedema komkujiyê ne tore û namûs e, komkujî di encama pergala cerdevahiyê de pêk hatiye.

Jinên endamên ÎHD, KESK, TTB, Halkevlerî, Meclîsa Aştiyê ya Tirkiyeyê, Platforma Jinên Endezyar û Weqfa Hevgiriya Jinan ku bi heyetê komkujiya Gundê Zankirtê lêkolîn kirin, çavdêrî û daneyên berhev kirîn bi daxuyaniyeke li Navenda Giştî ya ÎHD'ê dayîn, aşkera kirin. Di daxuyaniya nûnerên saziyan lê beşdar bûn de ji berdevkên Meclîsa Aştiyê ya Tirkiyeyê Yuksel Mutlu rapor aşkera kir. Mutlu diyar kir ku bi şaredarên jin ên DTP'ê û 6 saziyên jinan ên li Amedê re têkildarî mijarê lêkolîn kirine. Mutlu wiha axivî: "Ji Walî heta Miftî em bi her kesî re axivîn. Ji ber ku komkujiya bû sedema mirina 44 kesan di çapemeniyê de wekî magazînê hate dayîn, em çûn herêmê. Di encama lêkolîna me kir de ji bo dawî li bûyerên wiha bê divê pirsgirêka kurd çareser bibe." Sekretera Giştî ya KESK'ê Songul Morsunbul jî daxuyand ku pirsgirêk rasterast bi neçareserkirina pirsgirêka kurd re eleqedar e û ji bo çareseriyê divê pirsgirêka kurd bê çareserkirin. Morsunbul daxuyand ku wekî KESK'ê dê ji bo çareseriya pirsgirêkê hewl bidin. Di raporê de jî sedema komkujiyê wekî pergala cerdevaniyê tê nirxandin û ji bo cardin komkujiyên wiha pêk neyên pêşniyara rakirina pergala cerdevaniyê û çareserkirina pirsgirêk kurd tê kirin.



***Di rapora jinan de ev tespît hatin kirin:***

✓ Sedema komkujiyê pergala cerdevaniyê, cerdevanên dewletê çek dane wan û miaşê wan dide ye. Her wiha pêşveçûna hişmendiya zilamî di encama vê polîtîkayê de jî bandor li ser komkujiyê kiriye.

✓ Bûyer ji bo jin û zarokên sêwî mane travmatîktir e.

✓ Ligel ku di navbera gund û qereqolê de 6-7 deqîqe rê hene jî leşker 2 seatan piştî bûyerê çûne gund.

✓ Ji bo zarok û jin jiyana xwe bidomînin divê piştgiriya civakî, psîkolojîk û aborî bê dayîn.

✓ Ji bo pêvajoya niha baştir bi pêş bikeve divê koordînasyoneke Walîtî, Şaredar, nûnerên rêxistinên civakî û nûnerên gundê bûyer lê qewî jî di nav de cih digirin bê avakirin.

***Di raporê de ev pêşniyar hatin kirin:***

✓ Divê Wezîrê Karên Hundir aşkera bike ka çima piştî bûyerê komkujî wekî 'kuştina tore û namûsê' nîşan daye.

✓ Leşker çima piştî 2 seatan çûne gund û divê ev yek bê daxuyandin.

✓ Divê îdiayên têkildarî rantê yên bi dewletê ve girêdayî ji raya giştî re bên aşkera kirin.

✓ Di nav gel de tê bawerkirin ku leşker û cerdevanan ji Xeta Boriya Petrolê ya BOTAŞ'ê neft diziye. Vê diziyê li ser bûyerê bandor kiriye.

✓ Têkiliya cendevanan a bi eronînê re heye û divê ev yek baş bê nirxandin.

✓ Hevsera Fermandarê Cendirmeyan a Gundê Zankirtê li gund mamoste ye û çend roj berî bûyerê bi hinceta piyê xwe êşandiye, derketiye derveyî gund. Keseke ji ber nexweşiyê rapor girtî divê li cihê xwe be. Çima hevsera Fermandar derketiye derveyî gund? **ENQERE**


Fatma Kaşan

# Konferansa çareseriyê pêk tê

Meclîsa Jinan a DTP'ê der barê mijarên wekî "Çareseriya pirsgirêka kurd", "Rêxistinkirina jinan" û "Berdewamkirina projeya 23 jinên hatine girtin" dê di 4 -5'ê hezîranê de li Wêranşara Rihayê konferansekê pêk bîne.

Meclîsa Jinan a DTP'ê di çarçoveya kampanya, "Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye' de bi dirûşma, "Di siyaseta demokratîk de em xwe bi rêxistin bikin, daxwaza azadiyê zêde bikin" li Wêranşarê bi beşdariya 300 delegeyî konferansê pêk tîne. Cîgira Berdevka Meclîsa Jinan a DTP'ê Fatma Kaşan, anî ziman ku di operasyona 14'ê nîsanê de 23 endamên Tevgera Jinan a Azad û Demokratîk (DOHK) hatin girtin û bi girtina 23 endamên DOKH'ê xwestine ku derbeyekê li azadiya jinê bixin. Kaşan, diyar kir ku ew ê bi vê konferansê asta hêza jinê û daxwaza jinê ya azadiyê bidin nîşandan. Kaşan, bi bîr xist ku hêza jinan heye ku li hemberî hemû êrîş û zordariyan li ber xwe bidin.

Kaşan, da zanîn ku konferans dê li ser sê mijaran pêk bê û wiha dom kir: "Em ê di konferansê de li ser rojeva Xebata Rêxistinî, rewşa siyasî û di siyaseta rêvebereya herêmî de rol û erka jinê binirxînin. Me di 2 salên dawî de gavên girîng avêtin. Di vê encamê de me Meclîsa Jinan a Bajar ava kir. Wekî DOKH'ê em ê rewşa rêxistina xwe, berpirsiyariyên xwe û xebatên xwe li ber çavan raxin. Pêşxistina civakê ji hêla çandî û civakî ve jî girêdayî pêşxistina jinê."Kaşan, destnîşan kir ku ji ber ku aliyekî Rihayê yê feodal heye wan cihê konferansê wekî Riha hilbijart. **AMED**

# Pêkutiya 69 salan

**Pêkutiyên li ser Sadiye Avaganê di 7 salî de dest pê kir û heta 76 saliya wê li ser wê domkir. Di serî de ji hêla bavê xwe, birayê xwe, 3 hevserên xwe û zarokên hevserên xwe ve bi pêkutiyan re rû bi rû maye**

Saddiye Avag di sala 1933'yan de li navçeya Qebilcewiza Êlihê hatiye dinê û hîn di 7 saliya xwe de rastî şîdeta bavê xwe hatiye. Piştî bavê wê wefat kir vê carê jî rastî şîdeta birayê xwe tê. Saddiye Avag ku piştre 3 caran bi zorê bi kesên di temenê bavê wê de re hatiye zewicandin, jiyaneke wekî kabûsê derbas kiriye. Avag ku di temenê 69 salan de ji hêla bav, bira û hevserên xwe ve rastî şîdetê hatiye bi gotina "Kes guherîn lê pêkutî negerîn" hestên xwe tîne ziman.

Saddiye Avag piştî pêkutiya bavê xwe rastî lêdana birayê xwe jî tê. Avag, ku 3 salan ligel birayê xwe dimîne. Di vê navberê de birayê wê ji Amedê keçekê direvîne. Birayê Avag bi boneya nikare qelenê keçika revandî bide, xwîşka xwe bi zorê bi Mehmet Înakê 60 salî re dizewicîne.

Avag ku wekî bûke diçe Amedê ligel zilamê 48 sal jê mezintir dijî. Avag, diyar kir ku bi êş jiyana xwe domandiye û wiha got: "Min tevî karê qedimê her sibê nan li tenûrê dixist. Min debara mala xwe bi firotina nanê tenûrê didomand. Ez di karê titûnê de jî xebitîm. Min bi pereyê distand zarok mezin kirin. Min di 15 saliya xwe de kurek anî dinê. Salek piştî çêbûna kurê min hevserê min jiyana xwe ji dest da. Piştî ku hevserê min jiyana xwe ji dest da kesêkî ku li min û kurê min binêre nema." Dîsa bi zora birayê xwe bêdil bi kesê bi navê Saddullah Çinarê 50 salî re tê zewicandin. Avag ku bi zewaca 2'yemîn êdî li Elihê bi cih dibe û vê carê jî rastî pêkutî û lêdana hevserê xwe Çinar tê wiha domand: "Ez di tevahiya emrê xwe de rastî pêkutiyan hatim û bi kesê di emrê bavê xwe de re hatim zewicandin. Her dem rastî lêdan, pêkutî û heqaretên hevserê xwe yê 2'yemîn hatim. Ji hevserê mîn ê 2'yemîn kurekî min çêbû. Dîsa dema ku kurê min sala xwe temam kir hevserê min jiyana xwe ji dest da. Piştî hevserê min jiyana xwe ji dest da, êdî rastî pêkutiyên malbata wî hatim. Êdî her roj birê hevserê min li min dida. Bi van pêkanînan jî dilê wan rehet nebû, kurê min revandin û ez ji malê qewirandim. Ji neçarî ez dîsa çûm gel birayê xwe yê ku jiyana min vegerand kabûsê. Dema ez 25 salî bûm birayê min vê carê jî ez dam kalê 70 salî yê bi navê Abdulmecîd Avag, ku 5 zarokên wî hebûn. Min ev zewac jî bê dilê xwe kir lê mafê min ê axaftinê tune bû."


Saddiye Avag

**Hînî pêkutiyan bûm**

Li ser êşên kişandîn Avag bi bîr dixe ku di tevahiya jiyana xwe de rastî pêkutiyan hatiye û wiha domand: "Zewaca min ya 3'yan jî bû kabûs. Rewşa hevserê min a aborî nebaş bû û ji ber wê jî ez di karê çapeya zeviyan de xebitîm. Min li her 5 zarokên ku ne ji min bûn nihêrî. Hevserê min ê 3'yemîn jî lêdan û heqaret li ser min domand. Ez hînî pêkutiyan bûm. Ji cewaca min ya 3'yemîn jî keçeke min çêbû. Min bi karê çapeya zeviyan li keça xwe û 5 zarokên hevserê xwe nêrî û mezin kirin. Di tevahiya jiyana xwe de min cara yekem biryar girt ku li Fabrîkayan Tutinê ya li Hazoyê kar bikim. Hemû malbat li hemberî biryara min derket. Çawa jinek dê bi tena serê xwe di karê fabrîkayê de kar bike. Ji ber di fabrîkayê de zilam jî hebûn, li hemberî biryara min derketin. Tevî hevserê xwe ez rastî lêdan û xeberên 5 zarokên hevserê xwe jî dihatim. Di jiyana min de kes guherîn lê rengê pêkutiyan nehatin guhertin." **ÊLIH / DÎHA**

## Her roj pêkutî...

Saddiye Avag, diyar kir ku piştî hevserê wê jiyana xwe ji dest da, pêkutiyên zarokên wî li ser wê zêdetir bûne û wiha got: "Min keça xwe mezin kir û ew zewicand. Ez li gel zarokên hevserê xwe mam. Lê pêkutiyên wan li ser min kêm nebûn. 4 sal berê ez ji aliye zarokê hevserê xwe ve ji malê hatim avêtin. Mala ku min bi keda xwe standibû jî zarokên hevserê min ji destê min derxistin. Ji ber ez ji mala xwe hatim avêtin, ez hatim gel keça xwe. Ez 76 salî me lê min rojek bi dil rehetî derbas nekir. Min her tim êş kişandin. Pêkutiyên ku di 7 saliya min de dest pê kirin heta 76 saliya min li ser min hatin domandin. Di serî de bavê min, birayê min, 3 hevserên min û zarokên wan li min pêkutî kirin.

# Li dijî şîdeta cinsî peymaneke navneteweyî

Di şer de tecawiz, li welatên paşvemayî tore û li rojavayê lêdan pirsgirêkên herî giran ên cîhanê ne. Li dijî van pêkanînan xebata peymana navneteweyî tê amadekirin.

Di rojeva Komîsyona Wekheviya Jin û Mêran a Meclîsa Parlamenterên Konseya Ewropayê (MPKE) de li dijî şîdetê têkoşîn heye. Di şer de bêtir jin mexdûr dibin. Di şerê wekî li Bosna, Raunda, Kongo û Darfurê pêk hatin de herî zêde jin bi êrîşên cinsî re rû bi rû man. Endama Meclîsa Parlamenterên Konseya Ewropayê parlamentera Belçîkayê Miet Smet, diyar kir ku di şerê 15 sal beriya niha li Ewropayê pêk hatî de sûcên tecawizê wekî sûcên mirovahiyê nehatine qebûlkirin. Welatên Ewropayê di qebûlkirina sûc de gelekî dereng mane.

**Divê perwerdehiyên taybet pêk bên**

Smet, destnîşan kir ku li gorî nûçeya Deutsche Welleyê di şerê Bosnayê de sûcdarên tecawizê ceza negirtin. Smet da zanîn ku mexdûrên tecawizê tenê hatin hiştin. Smet, ji bo komîsyona MPKE'yê raporek amade kir. Li gorî rapora Smetê divê welatên van sûcan pêk anînê divê bêne darizandin û wiha axaftina xwe dom kir: "Li jinên ku bûne mexdûr divê alîkariya tibî, psîkolojîk û aborî bê kirin. Piştî li welatan şer bi dawî bû heyetên ku ji mêran pêk hatî wekî hêza aştî hatin şandin. Lê divê ev tişt jî bê guhertin û jin di nav wan heyetan de cih bigirin. Her wiha hêza leşkerî ya aştiyê divê li dijî êrîşên cinsî perwerdehiyeke taybet bigire."

Raportora Taybet a Li Dijî Şîdeta li Hemberî Jinan a Neteweyên Yekbûyî Prof. Dr. Yakin Erturk, bal kişand ser peyama ku tê amadekirin û got ku xebatên peyama li dijî şîdeta li hemberî jinan peyama navneteweyî didome. Erturk, daxuyand ku biryara 'Ewlehiya Jinan û Mafên Mirovan' a Konseya Ewlehiya Yekîtiya Ewropayê di sala 2000'î de dayî gaveke girîng bû û Erturk wiha axivî: "Li gorî biryarê hêzên leşkerî, rayedarên ewlehiyê û artêş dê bi mijara şîdeta li hemberî jinan re mijûl bibin. Her wiha di sala 2008'an de biryareke din hate girtin. Li gorî wê biryarê jî hêza aştiyê dê li dijî şîdeta cinsî têbikoşe. Êdî li dadgehên ceza yên navneteweyî dê di şer de sûcên cinsî wekî sûcên mirovatiyê bê dîtin." **FRANKFURT**

# Li Patnosê cara yekem jinek bû Cîgira Şaredar

Li navçeya Patnosê ya Agiriyê cara yekemîn e jinek wekî cîgira şaredar hate tayînkirin. Di civîna Meclîsa Şaredariya Patnosê de du cîgirên şaredar -Nezahat Guler û Abdulhak Anacan- hatin tayînkirin. Bi vê biryarê re li Patnosê cara yekem jinek dibe cîgira Şaredar. Guler ji berê ve di nava xebatên HADEP, DEHAP û DTP'ê de cih girtiye. Guler, ji ber ku weke Cîgira Şaredar hatiye tayînkirin gelekî kêfxweş e. Guler, diyar kir ku ji bo gelê Patnosê çi ji destê wê bê dê bike. Guler, destnîşan kir ku dê bi taybetî bi jinan re xebatan bimeşîne. **AGIRÎ**

# Bîranîn


Salîme Argun
1974 - 2008

Dibêjim:
Her bariya
bêdengiyê li ser
êvaran.
Bi zilmateke ji
nişka ve
xwe li şeverêkan
dixim
xemgîniya te
li ser namilên min
yê westayî

**Li ser navê malbata wê dayik wê Selma, xwîşka wê Semiye, Gulistan, Dilşa û birayê wê H. Îbrahîm**

www.arsivakurdi.org

Hawar
22 Gulan 2009 În

# Karkerên kurd ên demsalî ketin rê

Li Amedê hêviya rêwîtiya karkerên demsalî dest pê kir. Li Gara Trênê ya Amedê zarok, jin û extiyar bi torbeyên nivîn û xwarinên xwe derketin ser rê. Karker ji karê ku dikin û rewşa xwe ne razî ne û diyar kirin ku ligel ku îmkanên wan hene jî axa xwe terk nakin. Karkeran destnîşan kir ku li ser axa xelkê bi pereyekî kêm dişuxulin û her wiha li cihê ku dişuxulin jî marûzê newekheviyê tên.

Karkerên demsalî li Gara Trênê ya Amêdê berhev bûn. Trên ji Amedê diçe herêmên Çukurova û Anatoliya Navîn. Karkeran zarokên xwe ji dibistanan girtine û li cihên ku diçin lê dixebitin jî rastî pêkutiyan tên. Li hin herêman dibin hedefa êrîşan. Karker di bin şert û mercên giran de 7 mehan bê av û bê ceryan dixebitin. Her wiha fatureya herî giran jî li jinan tê birîn. Jinên ku bi roj li ser erd dixebitin bi şev jî karê malê dikin.

### Jiyana wan rojane ye

Karkerê demsalî yê bi navê Mehmet Înce ku ji Amedê koçî Enqereyê dike diyar kir ku hemû jiyana wan li nava erdan derbas dibe û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ez bi 10 zarokên xwe derdikevin ser riyên koçberiyê. Li herêmê îmkanên kar ji bo me nîn in. Erdên me jî bê edaletî hatine parvekirin. Ji ber vê yekê 7 mehên salî em li ser erdên xelkê derbas dikin. Em tenê 5 mehan li gundê xwe dimînin. Di wê demê de jî em bi deyn jiyana xwe didomînin. Yanî jiyana me jiyaneke rojane ye. Eger ku îmkanên kar hebûna û erdên me bi awayekî edaletî bihata parvekirin em ê wiha perîşan nebana. Dewlet tenê piştgiriyê dide begên herêmê. Gel jî perîşan dibe.



### Zarok dibistanan nîvco dihêlin

Zarokê bi avê Aslan Eren (13) ku diçe pola yekemîn a lîseyê diyar kir ku bi malbata xwe re koç dike û karneya xwe jî dê negire. Eren wiha got: "Eger ku em ne şixulin em ê birçî bimînin. Ez dibistana xwe berdidim û diçim pîvazan berhev dikim. Xebata li ser erdan gelekî zehmete. Min gelek dixwest ku ez karneya xwe bigirim. Dayika Aslan Eren, Emîne Eren jî got ku ji ber xizaniyê perwerdehiya zarokên wan jî nîvco dimîne û wiha pê de çû: "Ji bilî kurdan tu kes li binê wê roja germ naxebite. Ger kar hebûya em ê neketana van riyan. Di van şert û mercên giran de herî zê de jin tengasiyê dikişînin. Cihê ku em diçinê ne av û ne jî ceryan lê heye. Ji bo ku em avê bînin bi kîlometreyan em dimeşin."

### Kurdan cuda dibînin

Welatiyê bi navê Mehmet Duman ku bi 11 zarokên xwe re ji Amedê diçe Enqereyê destnîşan kir ji ber ku kurd in li cihê ku lê dişixulin nayên qebûlkirin. Duman wiha got: "Em bi çêrên ku rûmeta me dişikênin re rû bi rû dimînin. Gelek caran em ji aliyê leşker û şaredaran ve nayên qebûlkirin. Newekheviyê dikin navbera karkeran. Em her sal dibêjin ku em ê êdî neçin. Lê ji ber neçariyê ez bi 11 zarokên xwe re dikevim riyan. Tu hêviya me ji dewletê nîn e." Emdamê Komîsyona Çandiniyê ya Meclîsê parlameterê DTP'ê yê Rihayê Îbrahîm Bînîcî, diyar kir ku rewşa ku karkerên çandiniyê tê de ne, di sedsala 21'emîn de eyba herî mezin e û wiha got: "Derbarê vê mijarê de hemû pêşnûmayên me ku min dane bê bersiv man. Birîneke herî mezin ya dewletê koçberî ye. Her tim di meha nîsanê de nakliyata mirovan tê kirin. DTP'ê ev pirsgirêk dem bi dem bir meclîsê. Lê meclîsê ev qebûl nekir. Ji bo vê rewşê tu hewldanek tune ye. Ji aborî û perwerdehiyê merhûm in."

Bînîcî di berdewama axaftina xwe de wiha got: "Ji bo zarokan em ê vê pirsgirêkê bibin meclîsê. Ji qedandina dibistanan re du meh maye. Zarok tên girtin. Divê ji bo vê projeyek pêk bê. Li hemberî kurdan newekhevî pêk tê. Ji ber vê jî em ê bê deng nemînin." **AMED**





# Ji vê derê Bakur, Başûr û Rojhilat xuya dikin

Çiyayê Evdal Kovî ji ber bilindahiya xwe bi mij û dumam e. Li lûtkeyên wê sê parçeyên Kurdistanê xuya dike. Bi biharê re ji hemû derên wê kanî diherikin û di meha havînê de jî ji ber bilindahiya xwe sar e

**MEHMET NURÎ EKÎNCÎ** XAKURK / ANF

Çiyayê Evdal Kovî bi sekna xwe ya bi ser Deşta Heyatê re wek peykerekî rewnekdar dixuye. Em jî di bin vê bandorê de dimînin û herî dawî biryar didin ku biçin lûtkeya wî. Dema min ji gerîlayên li herêmê re vê pêşniyarê got balkêş e ku wan jî got "em jî dixwazin hilkişin çiyayê Evdal Koviyê"

Ger ku tu bixwazî li vî çiyayî bigerî, divê tu ji gerîlayan, riya van çiyan bipirsî. Me jî ji wan pirsî. Hem dê di rê de pêşengtiya me bikin û hem jî dê ji me re xweşikbûna çar demsalan vebêjin.

Ji bo ku ewlekarî mijara gotinê bû, bi wan re rêwîtî avantajeke mezin e. Me bi çend gerîlayan re biryar da ku em serê sibê bikevin rê. Hêj tîrojên rojê derneketibûn, em bi rojbaşên gerîlayan şiyar bûn. Taştê amade bû. Bi şîara 'an serkeftin, an serkeftin' îçtîmayên xwe girtin û piştî taştê em derketin ser rê. Di rêwitiya me de pêşengê me gerîla Erdal Maku bû. Evdal Kovî tê wateya welatê biyaniyan. Li gorî rîwayeteke din jî gundiyekî bi navê Abdullah ji bo seyda bizinên biyanî diçe û di encamê vê de aqûbeta wî nayê zanîn. Piştre jî çiyayê reş navê Evdal Kovî digire. Evdal Kovî ji zinarên volkanîk pêk tên. Ji ber çiyayekî asê ye. Dema ku mirov ji dûr ve lê dinêrin wekî zinarên reş xuya dike. Ligel hemû taybetiyên xwe, xwedî taybetiyeke girîng e.

### Dîmeneke bi heybet

Dema ku mirov nêzî Evdal Kovî dibe çirûskên xweşikbûna wê baştir xwe dide xuyakirin. Ji bo bêhnvedanê em sekinin û me çay vexwar. Piştî bêhnvedanê em careke din kete rê. Hilkişandina çiyayê Evdal Kovî gelek zehmet e. Ji ber van taybetiyên wî jî divê mirov qasî , bizineke biyanî û çiyagerekî vî çiyayî zanibin. Ji bilî min hemû hevalan ev çiya baş dizanî bû.

Bi zehmetiyên mezin mirov hildikişin ser Evdal Kovî. Ligel hemû astengiyan em hilkişiyan ser Evdal Kovî. Ji ber ku çiya gelek bilind e di meha tîrmehê de jî sar e. Li wir ba hişk û bi şîdet e. Ligel ku meha biharê ya dawî ye jî ji her derê av diherike.

### Li lûtkeyên Evdal Kovî…

Ji bo ku em bigihêjin lûtkeyê nêzî sed kîlometre mabû. 10 deqe mabû û piştî deh deqeyan em gihîştin lûtkeyê. Ji ber ku Evdal Kovî çiyayekî volkanîk bû, zinarên wê heliyabûn ji kevir, xîz, û axê pêk dihat. Du çeper bala mirovan dikişînin. Dibe ku ji şerê Îran û Iraqê mabe.

Li cem çeperan jî kovanên vala hebûn. Ji vir şûnde jî valahî hebûn. Li dora çiyayê Evdal Kovî Xakurkê, Deşta Heyatê û Deşta Hertedê heye. Piştî ku me hewaya wê ya xweş kişand hundirê xwe ji bo vegerê em ketin rê. Li lûtkeyên çiyayê Evdal Kovî bakur, başûr, û rojhilatê Kurdistanê tê xuyakirin. Ava Lolanê û ava Hecîbegê digihêjin hev. Qasî ku hilkişandina Evdal Kovî zehmet e, daketina wê jî ew qas zehmet e.



# Şilêr li benda parastinê ye



Şilêrên Colemêrgê ku bi hatina biharê re çiya û zozanan dixemilînin, ji ber bi nezanî têne komkirin ber bi tunebûnê ve diçin. Serokê Veqfa TEMA'yê ya Geverê Yildirim Esener, xwest şilêrên Colemêrgê bêne parastin.

Şilêr ku tenê li Çiyayê Cîlo şîn dibin bi hatina biharê re çiya û zozanên Colemêrgê xemilandin. Şilêr ku di nava gel de wekî 'Laleya digirî' tê zanîn ji ber ku tenê li Çiyayê Cîlo şîn tê nirxê xwe diparêze. Şilêra ku 75 santîman bilind dibe û li ser her şaxekê 6 laleyên serberjêr geş dibin. Şilêr wekî rengeke bedew a xwezayê li benda parastinê ye. Serokê Veqfa TEMA'yê ya Geverê Yildirim Esener, diyar kir ku şilêr bi nezanî tên komkirin û ev yek zirareke mezin didê. Esener diyar kir ku sal bi sal nifş û dola wan kêm dibe û ber bi tunebûnê ve diçin. Esener, xwest ku nifşên van şilêran bêne parastin.

### 'Divê tovê wan bê tespîtkirin'

Esener, ji bo parastina Şilêran wiha got: "Divê nifş û dola genetîka şilêrên herêmê bêne tespîtkirin û rê li pêşiya laleyên sixte were girtin. Bi vê yekê cureyê wê bê parastin. Her wiha tovê wê bi taybetî bê parastin û bê zêdekirin. Dîsa divê ji hilberînerên herêmê re destûr bê dayîn û gelê herêmê jî karibe cureyên van şilêran biçîne û wekî çavkaniya aborî derfetên kar zêde bike. Dîsa ji bo parastina xwezayê divê çanda hilberîna rançink perwerdehî bê dayîn û bi zêdekirina van laleyan re ekolojî bê parastin."

Endamê Komelaya Xwezayê ya Cîloya Geverê Şahabettîn Sorma jî xwest şilêr bêne parastin û wiha got: "Divê tu kes, bêyî ku destûr bistîne şilêran ji koka wan qut neke û nifşên wan qir neke. Bi taybetî di salên dawî de her kes li gorî xwe şilêran ji koka wan qut dike. Pêwîst e li ser vê yekê gel bê perwerdekirin. Ger ku ji bo parastina şilêran xebat neyê kirin dê di demeke nêzîk de nifşên wan winda bibin." COLEMÊRG

www.arsivakurdi.org